

K.T.
Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê
Enstîtuya Zimanên Zindî
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

DÎWANA ŞÊX MUHEMMED NÛRÎ
(Metn û Lêkolîn)

Teza Lîsansa Bilind

Halis KAYA

Şêwirmend
DOÇ. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

WAN 2019

T.C.
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı

ŞEYH MUHAMMED NURİ'NİN DİVAN'I
(Metin ve İnceleme)

Yüksek Lisans Tezi

Halis KAYA

Danışman
DOÇ. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

VAN 2019



T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ danışmanlığında, Halis KAYA tarafından hazırlanan “**Dîwana Şêx Muhammed Nûrî (Metn û Lêkolîn)**” adlı bu çalışma, 20/08/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Kemal KAYA

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza:

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.



Dr. Öğr. Üyesi Nesrin SÖNMEZ
Enstitü Müdür Vekili

KURTE

Şêx Muhemmed Nûrî, di sala 1934an de, li Sêrtê hatiye dinyayê û hêj li heyatê ye. Ew; him mutesewif, him endamekî şaxa Xalidîtiyê ya Terîqeta Neqşebendîyan him jî şair û edîbek e ku kariye bi çar zimanên wek; kurdî, erebî, tirkî û farisî berheman bide û helbestan binivîse.

Ev xebata ku bi taybet li ser helbestên bi kurdî ên di Dîwana Şêx Nûrî de ye, ji destpêkê û pênc beşan pêk tê. Di destpêkê de behsa têkiliya edebîya kurdî ya klasîk û Xalidîtiyê hatiye kirin û atmosfera rewşenbîrî û ilmî ya di sedsala 19 û 20an de ya li Sêrtê hatiye nîşandayîn. Di beşa ewil de behsa jiyana û berhemên Şêx Nûrî hatiye kirin. Di beşa duyem de li ser şexsiyeta wî ya edebî hatiye rawestandî. Di beşa sêyem de Dîwan ji aliyê şiklî ve hatiye nirxandin. Di beşa çarem de behsa cureyên helbestan û mijar û temayên di Dîwanê de hatiye kirin. Di beşa pêncan de jî me cih daye metnê helbestê ku ji aliyê me ve transkrîpsiyona wê hatiye kirin. Lê me li gorî şiklê wan helbest ji nû ve tesnîf kirine û agahiyên hewce wek jêrenot nîşan dane.

Her wiha latînezekirina herfên erebî, li gorî alfabeya transkrîpsiyonê ya standart hatiye kirin.

Bêjeyên Sereke: Şêx Muhemmed Nûrî, Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Dîwan, Helbestên bi Kurdî.

ÖZET

1934 yılında Siirt'te dünyaya gelen Şeyh Nuhammed Nuri, mutasavvıf ve Nakşibendi Tarikatı'nın Halidiyye koluna mensub olmanın yanı sıra aynı zamanda bir şair ve müelliftir. Kürtçe, Arapça, Türkçe ve Farsça dillerine iyi derecede vakıf olup bu dillerde eserler verip şiirler yazmıştır.

Şeyh Muhammed Nuri'nin Divan'ındaki bilhassa Kürtçe şiirler üzerine olan bu çalışma, giriş ve beş bölümden oluşmaktadır. Giriş bölümünde 19 ve 20. Yüzyılda Halidilik ve Klasik Kürt Edebiyatı ilişkisi üzerine durulup Siirt'teki edebi ve ilmi atmosfer anlatıldı. Birinci bölümde müellifin hayatı ve eserleri üzerine duruldu. İkinci bölümde müellifin edebi şahsiyetine yer verildi. Üçüncü bölümde de Divan, şekil açısından incelenmiştir. Dördüncü bölümde de eserde geçen nazım türleri ve konular üzerinde incelemeler yapıldı. Beşinci bölümde de transkribe ettiğimiz Kürtçe şiirlere yer verilip nazım şekillerine göre yeniden tasnif edilmişlerdir. Gerekli görülen açıklamalar da dipnot olarak verilmiştir.

Ayrıca Arap harfeleri, standart transkripsiyon alfabesine göre latinize edilmişlerdir.

Anahtar Kelimeler: Şeyh Muhammed Nuri, Klasik Kürt Edebiyatı, Divan, Kürtçe Şiirler.

SUMMARY

Sheikh Nuhammed Nuri, who was born in Siirt in 1934, is a member of the Sufi and Khalidi sect, as well as a poet and author. He has a good knowledge of Kurdish, Arabic, Turkish and Persian languages and has been able to produce works and write poems.

Our study of Sheikh Mohammed Nuri's divan, especially Kurdish poems, consists of an introduction and five chapters. In the introduction, we focused on the relationship between Halidism and Classical Kurdish Literature in the 19th and 20th centuries, and tried to explain the literary and scientific atmosphere in Siirt. In the first part, we focused on the author's life and works. In the second part, we have included the literary personality of the author. In the third part, the divan is examined in terms of shape. In the fourth chapter, we focused on the verse types and subjects mentioned in the work. In the fifth chapter, the Kurdish poems that we transcribed were included and re-classified according to their verse forms. In addition, necessary explanations are given as footnotes.

Furthermore, the Arabic letters were latinized according to the standard transcription alphabet.

Keywords: Sheikh Muhammed Nuri, Classical Kurdish Literature, Divan, Kurdish Poems.

PÊŞGOTIN

Edebiyata kurdî ku ji gelek aliyan ve çavkaniyên xwe digre, bi sedan salan hebûna xwe qonax bi qonax di roja me de jî berdewam dike. Lê di her qonaxekê de bi renekî din vê hebûna xwe berdewam dike. Bi taybet di sedsala 19an de, bi têkçûna mîrektiyên kurdan re li herêmên kurdan atmosfereke nû peyda dibe. Di vê sedsalê de Mewlana Xalidê Şehrezorî radibe û şaxa Xalidîtiyê ya Terîqeta Neqşibendîtiyê ava dike. Bi saya xelîfeyên wî Xalidîtî, bi taybet li seranserê herêmên kurdan berbelav dibe û wê valahiya ku bi têkçûna mîrektiyên re çêdibe, dadigire.

Di vê qonaxê de êdî şairên kurd an dibin peyrevên vê terîqetê yan jî nûner û peyrevên vê terîqetê di heman demê de dibin nûnerên edebiyata kurdî ya klasîk jî ku ev reng ne wek sedsala 19 û destpêka sedsala 20an be jî di roja me de jî dewam dike.

Gelek mutesewif û alimên vê medrese û tekeyê, di heman demê de bi rengê xwe yê şair û edîb derdikevin pêş ku yek ji wan jî Şêx Muhemmed Nûriyê ji gundê Xinûkê ji Perwariya Sêrtê ye.

Şêx Muhemmed Nûrî wek mutesewifekî hevçax ku hêj li heyatê ye, di heman demê de xwedî dîwanekê ye ku ji helbestên wî yên; bi kurdî, erebî û tirkî pêk tê. Lê ji ber ku ev malbat bi renekî tesewufî naxwaze nav û dengê wan belav bibe û sohretek çêbibe heta niha Dîwana Şêx Nûrî zêde nehatiye nasîn û belavkirin.

Di vê xebatê de me xwest em bi taybetî li ser helbestên wî yên bi kurdî rawestînin. Xebata me ji destpêk û pênc beşan pêk tê. Di destpêkê de me behsa bi peydabûna Xalidîtiyê re têkiliya edebîya kurdî ya klasîk û ya vê terîqetê kir. Her wiha em li ser atmosfera edebî û rewşenbirî ya ku Şêx Nûrî tê de mezin bû jî sekinîn. Di beşa ewil de me behsa jiyan û berhemên Şêx Nûrî kirine û malbata wî jî daye nasîn ku gelek alim û edîb jê rabûne. Di beşa duyem de jî em di çarçoveya Dîwana wî de li ser şexsiyeta wî ya edebî rawestîyan. Di beşa sêyem de jî me Dîwan ji aliyê şiklî ve bi mînakên ji nav Dîwanê, nirxand. Di beşa çaran de jî em li ser wê yekê sekinîn ku Şêx Nûrî bi kîjan cure û mijaran, helbestên xwe nivîsine. Di beşa pêncan de jî me cih daye metnê helbestê ku ji aliyê me ve bi awayekî traskrîpsiyonî hatiye latînezekirin.

Di amadekirina vê tezê de ji bo alîkarî û keda wî ya hêja ez gelek spasî şêwirmendê xwe birêz Doç. Dr. Ömer Çifti dikim, her wiha ez sipasî mamosteyên

xwe birêz Prof. Dr. Abdurahman Adak û Dr. Nesim Sönmez ji dikim ku bi piştgirî û pêşniyazên xwe alîkariya min kirin. Ji bo pêşniyazên wî ez spasî mamosteyê birêz Doç. Dr. Mehmet Zahir Ertekin jî dikim.

Me piraniya agahiyên şahsî yê derbarê Şêx Muhemmed Nûrî û malbata wî de, ji kurê wî birêz Dr. Esat Özcan wergirtin. Ez ji bo wî jî gelek spas dikim ku ev agahî bi me re parve kirin. Ez spasî Seyda Ebdusselamê Bêcirmanî jî dikim ku ev destxeta li ber destê xwe da me da ku em li serê bixebitin. Her wiha ez gelek spasî mamoste Edhemê Şêxo jî dikim ku kontrola metnê Dîwanê kir û pêşniyazên xwe bi me re parve kirin.

WAN

2019



NAVEROK

KURTE	III
ÖZET	IV
SUMMARY	V
PÊŞGOTIN	VI
NAVEROK	VIII
KURTEBÊJE	XII
DESTPÊK	1
1. Ji bo Edebiyata Kurdî wek Qonaxeke Nû: Xalidîtî	1
2. Di Sedsala 20an de Atmosfera Rewşenbîrî û Ilmî ya li Sêrtê	2
BEŞA YEKEMÎN: JIYAN Ê BERHEMÊN ŞÊX MUHEMMED NÛRÎ	5
1.1. Jiyana Şêx Muhemmed Nûrî	5
1.1.1. Nav û Malbata Wî.....	5
1.1.1.1. Navdarên Malbata Wî	6
1.1.1.1.1. Şêx Es'edê Ewwel	6
1.1.1.1.2. Şêx Ebdullah.....	6
1.1.1.1.3. Şêx Es'edê Sanî(duyemîn)	7
1.1.1.1.4. Şêx Muşerref	7
1.1.1.1.5. Şêx Munewwer.....	8
1.1.1.1.6. Şêx Hemdullah	8
1.2. Herêm û Gundê Wî.....	9
1.3. Xwendin û Perwerdeya Wî.....	10
1.4. Zewac û Zarokên Wî	10
1.5. Meletî û Seydatiya Wî.....	11
1.6. Terîqeta Wî.....	12
1.7. Berhemên Wî.....	13
1.7.1. Berhemên Wî yên Menzûm	13
1.7.1.1. Dîwan	13
1.7.1.2. Mewlid	14
1.7.1.3. Nehcu'l Enam et-Turkî Fî 'Eqîdetî Ehlî's-Sunnetî ve'l-Cema'etî.....	15
1.7.2. Berhemên Wî yên Mensûr	16
1.7.2.1. 'Ezaimu'l Xeyratî fî Fedâilî'l Te'atî(Di Fezîletên Te'etê de Xêrên Mezin)	16

1.7.2.2. Ümmete Hidmet Risalesi(Rîsaleya ji bo Xizmeta Ummetê)	16
1.7.2.3. Bostanu'1 'Arifîn	17
1.7.2.4. Keşkul	17
1.7.2.5. Nezmû Derarî fi Mehasinî Berwarî.....	17
1.7.2.6. Wegera Nefahatu'1 Uns	17
BEŞA DUYEMÎN: KESEYATIYA WÎ YA EDEBÎ	18
2.1. Zimanê Wî.....	18
2.1.1. Taybetiyên Devoka Botî û Hekkarî	19
2.1.2. Taybetiyên Devoka Serhedê	22
2.1.3. Peyvên Xwerû yên Kurdî.....	23
2.1.4. Unsûrên Erebî, Farisî û Tirkî	23
2.1.4.1. Unsûrên Erebî.....	24
2.1.4.2. Unsûrên Farisî	25
2.1.4.3. Unsûrên Tirkî	26
2.1.5. Hunerên Edebî	27
2.1.5.1. Teşbîh.....	27
2.1.5.2. Telmîh	28
2.1.5.3. Teşxîs	28
2.1.5.4. Tenasûb	29
2.1.5.5. Tezad	29
2.1.5.6. Muqabele.....	30
2.1.5.7. Nîda	31
2.1.5.8. Tekrîr.....	32
2.1.5.9. Tesmît.....	32
2.1.5.10. Îstihfam	33
2.1.5.11. Teraduf (Sînonym).....	34
2.1.5.12. Mecaz	34
2.1.5.13. Rucû'	35
2.1.5.14. Tarîz	36
2.2. Mexlesa Wî.....	36
2.3. Edîb û Şexsiyetên ku li ser Şêx Nûrî Tesîr Kirine.....	37
2.3.1. Exmedê Xanî	37
2.3.2. Melayê Cizîrî	39
2.3.3. Şêx Muşerref.....	39

BEŞA SÊYEMÎN: JI ALİYÊ RUXSARÎ VE LÊKOLÎNA DÎWANÊ	43
3.1. Taybetiyên Teşeyê.....	43
3.1.1. Şiklê Tertîbê.....	43
3.1.1.1. Rêz, Hejmar û Herfa Qafiyeyê ya Helbestan	43
3.1.2. Dîwan an Dîwançe?	44
3.1.2.1. Rêz, Hejmar û Herfa Qafiyeyê ya Helbestên bi Kurdî.....	45
3.1.3. Ji Aliyê Nezmê ve Teşeyên Helbestan	46
3.1.3.1. Qesîde.....	46
3.1.3.2. Murebbe'	47
3.1.3.3. Yekmalik	49
3.1.3.4. Mesnewî	49
3.1.4. Wezn	50
3.1.4.1. Îmale.....	50
3.1.4.2. Zîhaf	51
3.1.4.3. Wesl	52
3.1.5. Qafiye(Serwa) û Cureyên Wê.....	53
3.1.5.1. Li Gorî Cihê Wê di Risteyê de.....	54
3.1.5.1.1. Serwaya Bêpaşserwa	54
3.1.5.1.2. Serwaya Bipaşserwa.....	54
3.1.5.1.3. Serwaya Navekî.....	55
3.1.5.2. Li Gorî Hevbeşiya Dengan Cureyên Serwayê	55
3.1.5.2.1. Serwaya Mucered	55
3.1.5.2.2. Serwaya Murdef	56
3.1.5.2.3. Serwaya Muqeyed	56
3.1.5.2.4. Serwaya Muesses.....	57
3.1.6. Redîf (Paşserwa).....	57
3.1.6.1. Redîfên ku di Halê Qertafan de ne.....	57
3.1.6.2. Redîfên ku di Halê Qertaf û Bêje an Kombêjeyan de ne	58
3.1.6.3. Redîfên ku di Halê Bêje an jî Kombêjeyan de ne	58
BEŞA ÇAREM: CUREYÊN NEZMÊ Û TEMAYÊN DI DÎWANÊ DE	59
4.1. Mersiye	59
4.2. Medhiye.....	62
4.3. Ne't.....	64
4.4. Tewhîd.....	65

4.5. Hicviye	65
4.6. Pend û Exlaq.....	66
BEŞA PÊNCAN: METNÊ DÎWANÊ YÊ BI TENKÎD	70
5.1. Danasîna Nusxeya Dîwanê.....	70
5.2. Rê û Rêbaza Amadekirina Metnê Dîwanê	70
ENCAM.....	112
LÎSTEYA TABLOYAN	113
ÇAVKANÎ.....	114
PÊVEK.....	116



KURTEBÊJE

amd.	: Amadekar
bnr.	: Binêrin
c.	: Cild
d.k.	: Dema Ketinê
h.b.	: Heman berhem
hwd.	: Her wekî din
h.	: Hejmar
k.d.	: Koça dawî
r.	: Rûpel
M.	: Murebbe'
MS.	: Mesnewî
YM.	: Yekmalik
Q.	: Qesîde
wer.	: Wergêr

DESTPÊK

1. Ji bo Edebiyata Kurdî wek Qonaxeke Nû: Xalidîfî

Mîrektiyên kurdan yên wek; Botan, Soran, Behdînan, Baban, Bitlîs ku li herêmên xwe xwedan statû û îktîdareke siyasî bûn, di encama polîtîkayên merkezîbûnê û -perçe bike bi rê ve bibe - yên dewleta Osmaniyan de, roj bi roj hêza wan hat şikandin û di encamê de di nîveka sedsala 19an de, bi temamî ji holê hatin rakirin. Helbet ev mîrektî bes ne wek îktîdareke siyasî bûn, di heman demê de di bin hîmaye û fînasmaniya wan de gelek medrese hatibûn avakirin ku di heyama klasîk ya edebiyata kurdî de hemû şairên kurd li van medreseyan perwerde bûbûn û bi awayeki di bin hîmayeya van îktîdaran de berhemên xwe dabûn.

Her wiha her çî qas ji bo bihêzkirina îdareya merkezî, Osmaniyan di sala 1847an de, li herêma kurdan Eyaleta Kurdistanê îlan kir jî ev sîstema siyasî ya nû bi ser neket û li Kurdistanê ji aliyê desthilatdariya siyasî ve valahiyeke mezin rû da. Lê belê di vê qonaxê de, di nav civaka kurdan de bizaveke dînî-tesewufî belav dibe ku ev bizav vê valahiyê bi temamî dadigire. Ev bizav jî Neqşîbendîtiya Xalidîtiyê ye ku di dawiya mîrektiyan de ji aliyê Mewlana Xalidê Şarezorî(k.d. 1826)¹ ve li Silêmaniyê hatiye damezrandin.²

Bi Xalidîtiyê re êdî ji bo edebiyata kurdî jî qonaxeke nû peyda dibe. Piştî ku mîrektî ji holê rabûn medreseyên wan jî ji holê rabûn. Êdî şûna medreseyên mîran medreseyên Xalidiyan hebûn. Kesên ku di van medreseyan de dixwendin di bin hîmayeya nûnerên Xalidiyan de diman û piraniya wan dema medrese xelas dikir dest bi nûnertiya Xalidîtiyê dikir. Vê serdemê edebiyata kurdî ya klasîk di van medreseyan de hebûna xwe domandiye. Dikare bê gotin ku tevahiya helbestvanên vê serdemê nûnerên Xalidîtiyê ne, yan pêgirtiyê wê ne, yan jî qet nebe di medreseyên

¹ Mewlana Xalid, di sala 1779an de, li Şehrezorê li bajaroka Qeredaxê ku bi ser Silêmaniyê ye, hatiye dinyayê û di sala 1827an de li Şamê koça dawî dike. Ew, avakarê şaxa Xalidîfî ya Terîqeta Neqşîbendîtiyê ye. Di sala 1805an de, ji bo hecê bi rê dîke û bi hin hedîseyên ku di vê rêwitiyê de diqewimin, meyla wî ya li ser tesewufê zêde dibe. Di sala 1809an de, diçe Hindistanê û piştî perwerdeya li balê ji Şêx Ebdullahê Dehlewîyê ku şêxekî Neqşîbendî bû îcazeta îrşadê digre û cardin vedigere Silêmaniyê û dest bi îrşadê dike. Bi vî rengî bi saya wî û xelîfeyên wî Neqşîbendîfî li herêmên kurdan û Anatolyayê gelek berbelavtir dibe û wek hêzeke nû ya dînî- civakî bi cih dibe.(Bnr., Hamid Algar, “*Halîd el-Bağdadi*”, TDV İslam Ansiklopedisi, c. 15, r. 283-285.)

² Bnr., Abdurrahman Adak, “*Serdema Xalidîtiyê di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*”, Kürt Tarihi, h. 30. r. 59.

wan de di bin hîmayeya nûnerên Xalidiyan de, perwerde dîtine. Ji ber vê yekê jî em vê qonaxa tarîxa edebiya kurdî wek serdema Xalidîtiyê dikarin bi nav bikin.³

Di çarçoveya edebiya kurdî de, Mewlana Xalid bes çend helbestên bi hewramî nivîsîne. Lê wek li jorê jî hat diyarkirin yan nûnerên edebiyata kurdî yên wek Siyahpoş êdî dibin pêgirtiyên wî yan jî nûnerên wî di heman demê de wek nûnerên edebiyata kurdî ya klasîk peyda dibin û êdî çend şaxên sereke yên Xalidîtiyê ên wek Şaxa Nehrî, Şaxa Basretê û Şaxa Tewîleyê ava dibin ku ji her şaxan jî nûnerên girîng ên edebiyata kurdî radibin.

Di vê çarçoveyê de ji bo sedsala 19 û 20an, bi taybet em dikarin behsa kesên wek: Pertew Begê Hekkarî, Wedaî, Seyîd Ebdulehê Nehrî(k.d. 1813), Wefayî(k.d. 1902), Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî, Xelîfe Selîm(k.d. 1914), Şewqiyê Xanî, Seydayê Licî(k.d. 1911), Mela Ehmedê Xasî (k.d. 1951), Mele Ehmedê Heyderî(k.d. 1937), Şêx Ebdurehmanê Aqtepi(k.d. 1907), Şêx Mihemed Can(k.d. 1909), Şêx Mihemed Kerbelayî(k.d. 1939), Şêx Mihemed Eskerî(k.d.1952), Şêx Hesîb(k.d. 1947), Şêx Muhyeddînê Hênî, Şêx Selîmê Sîneyî(k.d. 1914), Mehîwî(k.d. 1906), Mela Nûrullahê Godîşkî(k.d. 2003), Mela Zahirê Tendûrekî(k.d.1966), Seyîd Eliyê Findîkî(k.d. 1968) û hwd., bikin ku hemû jî him endamên Xalidîtiyê ne him jî xwedan berhem û nûnerên edebiyata kurdî ya klasîk in .⁴

Her wiha him Şêx Muhemmed Nûrî jî ku Dîwanan wî mijara teza me ye, him jî birayên wî Şêx Munewwer û Muşerref jî em dibînin di heman demê de him nûnerên edebiyata kurdî ne him jî endamên şaxa Xalidîtiyê ne ku vê malbatê heta roja me jî vî rengê xwe parastîye.

2. Di Sedsala 20an de Atmosfera Rewşenbîrî û Ilmî ya li Sêrtê

Sêrt ku bajarekî qedîm û kevnare ye ji bo perwerdeya klasîk a medreseyê û edebiyata kurdî jî yek ji navendên sereke ye. Li vê derê jî gelek medreseyên girîng hatine avakirin û ji bo Xalidîtiyê bûye yek ji navendên herî xurt. Şaxa Basretê ya Xalidîtiyê ku Basret gundekî Sêrtê bû lê niha wek îdarî bi ser Şirnexê ye, li vî bajarî hatiye avakirin. Ji vê şaxê gelek nûnerên Xalidîtiyê rabûne û bi saya tekye û medreseyên li vir atmosfereke xurt ya edebî û ilmî li vî bajarî peyda bûye.

³ Bnr., Adak, h.b., r. 59-60.

⁴ Bnr., Adak, h.b., r. 59-64.

Ji gelek zemanê kevin heta niha devera Sêrtê nemaze Tîllo, Helenzê û Şêrwan cihên medrese û tekyexane bûne. Vê demê jî ji hemû deverên Kurdistanê zêdetir kursên Qur'anê, medrese û tekyexane berdewam in.

Li devera Berwarî, Xesxîr û Xinûkê vê demê jî jiyana rewşenbîrî gelek diyar û berçav e. Qe nebe di van du sed salên dawî de dewlet serê Malbata Şêx Es'ed rewşenbîriyeke berçav heye û hêj jî berdewam e. Heta panzdeh sal berî niha jî li gelek gundên devera Berwarî medrese hebûne û ji wan medresan gelek xwendevan rabûne.⁵

Ji bilî malbata Şêx Es'ed, li Perwariyê û li herêmên din ên Sêrtê jî gelek malbatên zana û şêx rabûne. Malbata Şêx Îsmailê Feqîrullah, Malbata Mîrên Şêrwanê, Malbata Mele Xelîlê Sêrtê binekara wan vê gavê jî li Zoqeydê, li Êlihê, li Misircê û li Sêrtê dewam dike.⁶

Bi taybet medreseya Zoqeydê jî cihekî girîng digre ku ev medrese ji aliyê neviyê Mele Xelîlê Sêrtê(k.d. 1843) Şêx Ebdulqahar(k.d. 1906) ve hatiye avakirin. Ev medrese di demeke kurt de xurt dibe û alimên mezin lê radibin. Hem ji vî gundî hem jî ji derdorê ji bo perwerdeyê feqî tîr vir û bi vî rengî dibe yek ji girîngtirîn medreseyên li herêmê. Her wiha kesên wek Şêx Mahmûdê Zorqeydê(k.d.1945), û Şêx Cuneydê Zorqeydê (k.d. 1963) jî ku xwedan berhem in, li vê medreseyê perwerde bûne.⁷

Her wiha mirov dikare behsa medreseyên Erbîn û Kazimiyeyê jî bike. Medreseya Erbînê ji aliyê Şêx Fexreddînê(k.d.1914) kurê Şêx Muhemmedê Hezîn ve hatiye avakirin. Medrese û Dergaha Kazimiyeyê jî ji aliyê Şêx Muhemmed Hazînê Firsafî ve hatiye avakirin. Ji her du medreseyan jî gelek alim û zana rabûne.⁸

Dîsa di atmosfera rewşenbîrî û ilmî ya Sêrtê de Tîllo jî yek ji cihên herî girîng e. Bi taybet Medreseyên Mucahhidiye û Memduhiye di vê çarçoveyê de derdikevin pêş.

Medreseya Mucahhidiyeyê di sala 1958an de ji aliyê Mele Burhan ve hatiye avakirin û di roja me de jî carnan 500 feqî bi hev re lê perwerde dibin. Medreseya

⁵ M. Xalid Sadînî û Tehsîn Doskî, *Şêx Muşerrefê Xinûkî û Şairên Malbata wî*, Çapxana Parêzgeha Dihokê, Dihok 2013, r. 17-19.

⁶ Sadînî û Doskî, h.b., r. 13.

⁷ Bnr., Kadri Yıldırım, *Kürt Medreseleri ve Alimleri-Tekkelere Bağlı Medreseler*-, c. 2., Avesta Yayınları, İstanbul 2018, r. 179, 183-191.

⁸ Bnr., Kadri Yıldırım, h.b., r. 418-422.

Memduhiyeyê jî ji aliyê Mela Bedreddîn ve hatiye avakirin û li vê medreseyê jî perwerde berdewam e.⁹

Ji bilî van medreseyan li Havêlê Medreseya Mela Muhyeddînê Havêlî, li Arincê Medreseya Şêx Aliyê Arincî û li Werqanûsê jî Medreseya Malbata Şêx Fethullahê Werqanûsî hene û li van deran jî perwerde berdewam dike.¹⁰



⁹ Bnr., Kadri Yıldırım, h.b., r. 423, 427.

¹⁰ Bnr., Sadîmî û Doskî, h.b., r. 14.

BEŞA YEKEMÎN

JİYAN Û BERHEMÊN ŞÊX MUHEMMED NÛRÎ

1.1. Jiyana Şêx Muhammed Nûrî

1.1.1. Nav û Malbata Wî

Şêx Muhammed Nûrî, di 5ê Gulana sala 1934an de, li Sêrtê li gundê Xinûkê ku bi ser Perwariyê(Xesxîr-Xesxêr) ye, hatiye dinyayê û hêj li heyatê ye. Di resmîyetê de navî wî Mehmet Nuri Özcan e. Navê bavê wî Şêx Es'edê Sanî(duyemîn) ye, ew jî kurê Şêx Ebdullah, ew jî kurê Şêx Es'edê Ewwel(yekemîn) ew jî kurê Hecî ye. Hecî, li gundekî bi navê Vêlasê rûdinişt ku nêzikî Xesxîrê ye û niha jî mal û milkê vê malbatê li vî gundî heye. Lê silsîleya malbatê beriya Hecî bi awayekî teqez ne diyar e. Bi vî awayî zêdetirî du sed sal in malbata Şêx Nûrî, li Xinûkê bi cih û war bûye.¹¹

Binyata malbatê ji deşta Dûbanê hatiye lê ew bi xwe jî nizanin ka kengî û ji bo çi binemala wan ji wir hatiye.¹²

Navê diya wî jî Fatima ye. Ew jî keça Şêx Muhammed Emîn Erwasîyê kurê Şêx Fehîm Erwasî ye. Bavê wî Şêx Es'edê Sanî du caran zewicî ye. Şêx Nûrî, bi tevahî neh xwişk û bira hebûne. Şêx Muşerref, Şêx Munewwer, Maşeleh û Zemzeme xwişk û birayên wî yên heq in. Şêx Bedreddîn, Şêx Ubeydullah, Şêx Hifzûllah, Amîne û Effe jî xwişk û birayên wî yên ji jinbava wî Behiye xanimê ne ku ew jî keça Şêx Muhammed Emînê kurê Şêx Huseynê Basretî bûye û xanima duyem a bavê wî bûye.

¹¹ Di xebata mamoste Dr. Nesim Sönmez de hatiye diyarkirin ku "Hecî jî kurê Faris e û Faris jî tehsildarê Bedirxan Begê Botanê(1803-1868) bûye û ji bo ku Faris emr û fermanên wî bi awayekî rast û dirûst bi cih anîne muqabilî vê qed û xebata wî ev gundê Xinûkê diyarî wî kiriye."(Bnr., Dr. Nesim Sönmez, *Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî-Metn û Lêkolîn*, Seyda Yayınları, Diyarbakır 2018, r. 8.) Lê bi qasî agahiyên ku me ji malbata Şêx Nûrî wergirtine ev ne agahiyeke teqez e. Silsîleya malbatê heta Hecî teqez e. Lê beriya wî bi guman e. Her wiha îfadeya ku Faris tehsildarê Mîrê Botan jî bûye bi guman e. Lewra em dizanin bapîrê bavê Şêx Nûrî Şêx Es'edê Ewwel, di sala 1852yan de ji ber ku êdî kal dibe postnîşîniya tekyeya Basretê dihêle şûna Şêx Mihemedê Eynî. Di vê rewşê de ku em Faris wek bapîrê Şêx Es'edê Ewwel bihesibînin jî ihtimaleke pir zêf e ku ew gihabe serdema Mîr Bedirxan û katiptiya wî kiribe.

¹² Sadîni û Doskî, h.b., r. 16.

1.1.1.1. Navdarên Malbata Wî

Şêx Nûrî, ji malbat û sîlsîleyeke ehlê tesewuf û medreseyê hatiye. Malbata wî di sedsala 19 û bi taybet di sedsala 20an de, yek ji wan malbatên herî girîng e ku di warê; ilm, terîqet û edebiyata kurdî de berhem dane û li medreseyên xwe feqî perwerde kirine ku vî rengê xwe di roja me de jî berdewam dike. Ji bilî Şêx Nûrî, ji malbata wî 3 kesên din jî xwedan dîwanan in. Em ê li xwarê behsa şexsiyetên malbata wî yê xwedan tesîr û berheman bikin.

1.1.1.1.1. Şêx Es'edê Ewwel

Şêx Es'edê Ewwel (yekemîn), bapîrê bavê Şêx Muhemmed Nûrî ye. Ew bi xwe li gundê Xinûkê hatiye dinyayê û dîsa li vê derê wefat kiriye. Gora wî li vî gundî ye.

Şêx Es'ed, di sîlsîle û belavkirina terîqeta Neqşebendiyan de, cihekî girîng digre. Ew di warê ilmê şerîet û tesewufê da alimek mezin bûye û ehlê terîqeta Neqşebendiyan bûye. Wî xilafetî ji Şêx Salihê Sîpkî¹³ wergirtiye û piştî wî demek li Basretê postnişînî kiriye.¹⁴ Her wiha ew avakarê tekkeya Xinûkê û medreseya wê ye.

1.1.1.1.2. Şêx Ebdullah

Kurê Şêx Es'edê Ewwel û bapîrê Şêx Muhemmed Nûrî ye. Ew bi nasnavê Şêx Ebdullahê Atafî dihête nasîn. Ew jî zana û şêxên navdarîn deverê bû. Îcaza meletiyê li gundê Helenzeyê ji Mele Mustefayê Bedewî standibû û îcaza terîqetê ji Şêx Huseynê Basretê kurê Şêx Xalidê Zêbarî wergirtibû. Her wiha Şêx Ebdullah îcazeta terîqetê daye gelek kesan jî.¹⁵ Şêx Ebdullah di sala 1936an de wefat dike û li gundê Vêsalê tê veşartin.

¹³ Şêx Salihê Sîpkî(k.d. 1852) piştî Şêx Xalidê Cizîrî li Dergahê Basretê bûye postnişînê diwem. Şêx Salihê Sîpkî bi eslê xwe ji Bidlîsê ji eşîra Sîpîka ye. Di ciwaniya xwe de hatiye herêma Botan, li medreseya Tanzê xwendiyê û çûye Basretê Întisabî Şêx Xalid kiriye û ji wî xelîfetî standiye.(Bnr., Abdurrahman Cûdî, "Malbata Zêbarîyan û Basreta "Paytextê Neqşebendîyan"-1 -Heta bi Serdema Postnişînîya Malbata Zêbarîyan li Dergahê Basretê-" Nûbihar, h. 107, r. 31-32.)

¹⁴ Sönmez, h.b., r. 8.

¹⁵ Sadîni û Doskî, h.b., r. 17-19.

1.1.1.1.3. Şêx Es'edê Sanî(duyemîn)

Şêx Es'edê Sanî jî kurê Şêx Ebdullah û bavê Şêx Muhemmed Nûrî ye. Ew jî li gundê Xinûkê hatiye dinyayê û di sala 1967an de, li heman gundî wefat dike.

Gora wî jî li heman gundî ye. Îcazeya terîqetê ji bavê xwe Şêx Ebdullah wergirtiye û piştî wefata wî dibe mezinê terîqetê. Ji bilî îrşada terîqetê ew mirovekî mela û zana jî bû û wî dersên şerîetê jî didan feqîyan û wî gelek ders dabûn her du kurên xwe Şêx Muşerref û Şêx Munewwer jî û îzna terîqetê jî dabû wan.¹⁶

1.1.1.1.4. Şêx Muşerref

Şêx Muşerref, kurê Şêx Es'edê Sanî û birayê Şêx Muhemmed Nûrî ye. Ew di sala 1926an de li gundê Xinûkê, hatiye dinyayê û di 19ê Adara 2008an de di 82 saliya xwe de, li Sêrtê wefat kiriye û li vir hatiye veşartin. Ewilî li cem bavê xwe dest bi xwendinê dike. Ji bilî bavê xwe li çend cih û li cem seydayên din jî xwendina xwe berdewam dike ku ew jî ev in; li Xinûkê li cem Mela Ebdullahê Saruhî, li gundê Eynikê li cem Mela Teyyîbî, li gundê Helenzeyê li cem Mela Ebdulhekîmê Helenzî û demekê jî li ba Şêx Mustefayê Hemzewî.

Şêx Muşerref, îcazeta ilmê him ji bavê xwe him jî ji Mela Ebdulhekîmê Helenzî wergirtiye. Her wiha îcazeta terîqetê jî him ji bavê xwe him jî ji Şêx Mustefa Kemaleddînê Erbîlî wergirtiye.¹⁷

Şêx Muşerref, di jiyana xwe ya muderistiyê de bi sedan feqî perwerde kirine. Mirovekî zana, edîb, muderîs, şêxê terîqetê û piştî babê xwe mezinê terîqetê û gundê xwe û ruhsipiyeyekî Perwarî û hem Sêrtê bû.¹⁸ Ew, bi kurdî, erebî, tirkî û farisî baş zaniye û bi van zimanan gelek berhem nivîsîne ku ew jî ev in.

1. Dîwan
2. Kitêba Hacî Ehmed
3. Kitêba Mele 'Eledînî
4. Tehiyyetu'l Etfal
5. Şerha Luccetu'l- Estrarê
6. Mektubat

¹⁶ Sadînî û Doskî, h.b., r. 19.

¹⁷ Bnr., Sönmez, h.b., r. 9-10.

¹⁸ Sadînî û Doskî, h.b., r. 21.

7. Eyyuhel-Weled

Di warê edebiyata kurdî de, berhema wî ya herî girîng Dîwana wî ye ku ji helbestên wî yên bi kurdî, erebî, tirkî û farisî pêk tê ku ji wan zêdetirî 200 heb bi erebî ne, 78 heb bi kurdî û 10 heb jî bi farisî ne. Her wiha helbestek jî bi tirkî ye.¹⁹ Şêx Muşerref, him wek rêberekî manewî him jî wek şair û edîbekî tesîreke mezin li ser Şêx Muhemmed Nûrî hiştiye ku em ê di beşên pêş de behsê bikin.

1.1.1.1.5. Şêx Munewwer

Şêx Munewwer jî kurê Şêx Es'edê Sanî û birayê Şêx Nûrî ye. Di sala 1927an de, li Xinûkê hatiye dinyayê. Ew jî wek birayê xwe Şêx Muşerref ewillî li ber destê bavê xwe Şêx Es'edê Sanî dest bi xwendinê dike. Pişt re ligel birayê xwe Şêx Muşerref di sala 1942an de, diçe gundê Helenzê û li ba Mela Ebdulhekîm xwendina xwe dewam dike. Piştî demekê ji vir jî vedigere Sêrtê û li ba melayên li vir dixwîne. Piştî vê qonax jî bi dorê xwedîna xwe li gundê Eynikê li nik Mela Mahmûdê Eynikê û li gundê Zorqeydê li ba Şêx Cuneydê kurê Mela Mehmûdê Zorqeydê dewam dike.²⁰

Şêx Munewwer jî him di nav malbatê de him jî di çarçoveya edebiyata klasîk de yek ji şexsiyetên girîng e. Ew zana edîb û jêhatî bûye. Berhema wî ya herî girîng Dîwana wî ye ku ji helbestên wî yên bi kurdî û erebî pêk tê. Di nusxeya Dîwana wî ya li ber destê me de bi tevahî 25 helbest cih digirin ku 18 ji wan bi kurdî û 7 heb jî bi erebî ne.

Şêx Munewwer, di sala 1977an de di pêncî saliya xwe de, ji ber pençeşêrê li Sêrtê wefat dike. Gora wî li Perwariyê ye.

1.1.1.1.6. Şêx Hemdullah

Şêx Hemdullah jî kurê Şêx Munewwer e û biraziyê Şêx Nûrî ye. Di 28ê Tebaxa sala 1962yan de li Xesxîrê, hatiye dinyayê. Diya wî Muzeyyen xanim e ku ew jî ji newiyên Seyîd Fehîmê Erwasî ye.

¹⁹ Bnr., Sönmez, h.b., r. 13-14.

²⁰ Sadîni û Doskî, h.b., r. 30.

Şêx Hemdullah, ewilî li gundê Mexîzê li cem apê xwe Şêx Muhemmed Nûrî dest bi xwendinê dike. Heta 5 salan li vir kitêbên rêzê dixwîne. Pişt re jî qederekê li cem bavê xwe xwendina xwe dewam dike. Lê pişt re bavê wî wefat dike û xwendina xwe li Xinûkê li ba mamê xwe yê din Şêx Muşerref didomîne. Îcazeyê xwe ya ilmê bi awayekî şifahen ji Şêx Muşerref wergirtiye. Ligel dotmama xwe bi keça Şêx Muşerref re zewiciye. Piştî zewaca xwe ji sala 1979an heta niha li Xesxîrê li mizgefta bavê xwe meletî û muderistiyê dike.

Şêx Hemdullah jî di nav atmosfera tesewufî, ilmî û edebî ya malbata xwe de mezin bûye. Çil hedîsek û Mûnebihata Îbn Hacer wergerandine kurdî. Di warê edebiyata kurdî de, berhema wî ya herî girîng Dîwana wî ye ku tê de helbestên wî komkirî ne. Lê gelek helbestên wî jî winda ne.

Mexlesa wî ya şîran “Belengaz” e. Dema bavê wî Şêx Munewwer di sala 1977an de rehmet dike ew hêj pazdeh salî bû. Di sala 1994an de diya wî jî wefat dike. Bi gotina wî ji ber vê êtîmî û sêwîtiya xwe nasnavê xwe kiriye “Belengaz”.²¹

Her wiha xebat û xizmetên wî yê ilmî, tadrîsatî, we’z û nesîhatên wî di roja me de jî berdewam in.

1.2. Herêm û Gundê Wî

Şêx Muhemmed Nûrî, ji kurdên kurmanç e. Gundê wî Xinûk ku hemû niştecihên wê kurd in û bi tirkî jê re dibêjin “Güleçler”, li gorî parvekirina îdarî ya îro bi ser Perwariya Sêrtê ye. Her wiha li herêmê wek; Xinok, Xûnik û Xûnok jî tê telafûzkirin. Xinûk 6 km ji navçeyê dûr e û li ber çemê Botanê hatiye avakirin.²² Her wiha çemê Miks û Botanê li nêzî vî gundî digihên hev.

Perwarî jî dikeve bakurê rojhilatê Sêrtê. Li bakurê wê; navçeyên Hîzan û Miks(Bahçesaray), li rojhilatê wê; navçeyên Şax(Çatak) û Êlkê (Beytuşebab), li başûrê wê; bajarê Şirnex û navçeya Dihê(Eruh)ê û li aliyê rojavayê wê jî navçeyên Tillo/Aydinlar û Kufreyê(Şirvan) cih digrin. Wek erdnîgarî jî herêm herêmeke çiyayî ye û newalên kur tê de hene.²³

Xelkê Xinûkê, bi kurmançî diaxivin û hemû misilman in. Li deverê çî gundê xeyrî musulman nînin. Hema li hemû gundan mizgeft hene û xelkê deverê bi awayê

²¹ Bnr., Sadîmî û Doskî, h.b., r. 31-32.

²² Bnr., Sönmez, h.b., r. 5.

²³ T.C. Siirt Valiliği, *Pervari*, <http://www.siirt.gov.tr/pervari>, (Dk., 05. 06. 2019)

oldarî têne nasîn. Piraniya xelkê deverê peywendî bi malbata Şêx Es'ed ve heye û wekî mensûbiyet wan qebûl dikin.²⁴

1.3. Xwendin û Perwerdeya Wî

Şêx Nûrî, xwe baş perwerde kiriye û bi çar zimanan; bi kurdî, erebî, tirkî û farisî baş zaniye. Ew li ber destê alim û şairan perwerde bûye û xwendina xwe ya medreseyê li çend cihên cuda berdewam kiriye.

Ewilî li Xinûkê, li medreseya bavê xwe li ber destê bavê xwe Şêx Es'edê Sanî(k.d. 1967) dest bi xwendinê kiriye. Pişt re jî li gundê Helenzeyê, li cem Mela Ebdulhekîmê Helenzî²⁵ xwendina xwe dewam dike ku birayên wî Şêx Muşerref û Munewwer jî li vir xwendibûn. Piştî Helenzeyê jî dîsa ji bo xwendinê diçe medreseya Oxînê.²⁶ Li vir jî bi qasî şeş mehan li ba birayê xwe Şêx Munewwer dixwîne. Şêx Nûrî, piştî vê qonaxê jî vedigere Perwariyê û li medreseya birayê xwe ya Şêx Munewwer xwendin û perwerdeya xwe didomîne. Piştî xwendina xwe ya li vir vê carê jî diçe gundê Rûbarê(Yeniaydın) û li medreseya birayê xwe yê mezin Şêx Muşerref xwendina xwe ya medreseyê diqedîne.

Şêx Muhemmed Nûrî, îcazetnameya xwe ya ilmî, bi awayekî şifahen teqrîben di sala 1960î de, ji Mela Ebdulhekîmê Helenzî werdigre. Wek nivîskî jî ji birayê xwe Şêx Muşerref wergirtiye. Her wiha îcazetnameya xwe ya terîqetê jî ji birayê xwe Şêx Muşerref wergirtiye.

Hêja ye gotinê ye ku Şêx Nûrî, li mektebên fermî perwerde nebûye.

1.4. Zewac û Zarokên Wî

Şêx Nûrî, du caran zewiciye. Zewaca wî ya ewil di sala 1961ê de ye. Ji vê zewacê du ji wan kurik şeş zarokên wî çêbûne. Zewaca wî ya duyem jî salek piştî vê di sala 1962yan de ye. Ji vê zewacê jî keçek jê re çêbûye. Navên zarokên wî bi vî rengî ne: Wesfîye, Mihemed Huseyîn, Asya, Wefîye, Fatma, Esad û Eyşe.

²⁴ Sadîni û Doskî, h.b., r. 12.

²⁵ Helenzê berê gundek bûye; lê niha bûye yek ji taxên Sêrtê û bi tirkî jê re dibêjin "Bağtepe." Ebdulhekîm jî kurê Mela Hesên Kurê Mela Mustefayê kurê Mela Xelîlê Sêrtê ye. Li vir ders dida feqîyan.(Bnr., Sadîni û Doskî, h.b., r. 18.)

²⁶ Oxîn yek ji bajarokên Motkiya Bidlîsê ye ku bi tirkî jê re dibêjin "Koyunlu" Medreseya Oxînê niha jî li herêmê yek ji kevintirîn û girîngtirîn medreseyan e.

1.5. Meletî û Seydatiya Wî

Şêx Muhemmed Nûrî ku xwedan gelek berheman e, bi dehan salan bi sedan feqî perwerde kirine û li gelek medrese û herêman muderîstî kiriye. Hemû jiyana xwe ji bo îbadet, tefekur û di xizmeta ilm, perwerde û terîqetê de borandiye. Li her cihê ku çûyê hewl daye medreseyekê ava bike û bi vê hizrê gelek caran cih û warê xwe guhertiye.

Piştî ku îcaznameya xwe ya ilmî digre ewilî li gundê Rûbarê(Yeniaydın) li medreseya birayê xwe Şêx Muşerref dest bi muderîstiyê dike. Pişt re dizewice û tê li merkeza Perwariyê bi cih dibe û vê carê jî li vir li medreseya birayê xwe yê din Şêx Munewwer muderistiyê dike. Seyda pişt re jî li vir medreseya xwe ava dike û feqîyan perwerde dike. Şêx Nûrî, piştî vê qonaxê jî di navbera salên 1963-1966an de, li gundê Deştetanê(Gölgeli) bi cih dibe ku ew jî bi ser Perwariyê ye. Li vir medreseya xwe ava dike û dest bi meletî û perwerdekirina feqîyan dike. Piştî 6 salên li vî gundî cardin vedigere navenda Perwariyê û li medreseya xwe ya li vir xizmeta xwe berdewam dike. Şêx Nûrî, di sala 1975an de diçe gundê Mexêzê(Dolusalkım) û li vir jî medreseyekê ava dike. Heta sala 1978an li vir jî him meletiyê dike him jî muderistiyê. Piştî sê salan li vî gundî jî cardin vedigere navenda Perwariyê û li medreseya xwe ya li vir heta çûyîna Wanê ku di sala 1986an de ye, muderistî û meletiyê dike.

Şêx Nûrî, di qonaxa jiyana xwe ya li Wanê de jî li cihên cuda medresayan ava dike û li van deran him melatiyê dike him jî feqîyan perwerde dike. Dem û cihên ku Şêx Nûrî li Wanê medrese ava kirine û muderistî lê kiriye, bi vî rengî ne.

1. Di navbera salên 1986-1987an de, li navçeya Payîzavayê li gundê Sukunusê li medreseya xwe.
2. Di navbera salên 1987-1989an de, li Payîzavayê li gundê Arazê(Özlüce) li medreseya xwe.
3. Di navbera salên 1989-1992an de, li navçeya Tuşbayê li gundê Ayanisê(Ağartı) li medreseya xwe.
4. Di navbera sala 1992- 2010an de, li gundê Koçerî(Güveşli) ku bi ser merkeza Wanê ye, li medreseya xwe.

Şêx Muhemed Nûrî, li Stenbolê jî medreseyek ava kiriye û li vir jî xwendekar perwerde dibin. Her wiha tu caran bi awayekî resmî melatî nekiriye û teklîfên bi vî rengî jî red kirine.

1.6. Terîqeta Wî

Wek hemû şêxên malbata wî Şêx Nûrî jî ji şaxa Xalidîtiyê ya Terîqeta Neqşibendiyan e. Bapîrê bapîrê wî Hacî sofîyek bûye ji sofîyên Xalidî. Lê beriya wî ne diyar e ka bi çi awayî gihiştiye Mewlana Xalid.²⁷ Bapîrê wî Şêx Es'edê Ewwel jî ji çar xelîfeyên Şêx Salihê Sîpikî yek e û piştî wefata şêxê xwe beriya Şêx Mihemedê Eynî demeke kurt li Basretê²⁸ postnişîniyê dike. Lê ji bo ku kal bûye hêj ew li heyatê ye Şêx Mihemedê Eynî posnişîniyê digre ser milê xwe.

Şêx Nûrî jî xelîfetî û îcazeta terîqetê ji birayê xwe Şêx Muşerref wergitiye. Şêx Muşerref jî him ji bavê xwe Şêx Es'edê Sanî (k.d. 1967) him jî ji Şaxa Tewile/Beyarayê ji Şêx Mustefa Kemaledînê Erbîlî(k.d.1986) xelîfetî wergirtiye ku ew jî xelîfeyê bavê xwe Şêx Ebûbekîr Xiyaseddîn e. Şêx Xiyaseddîn jî xelîfeyê Şêx Osman Siraceddînê Tewîlî(k.d.1886) ye ku ew jî ji xelkê Tewîlê ye û li başûr xelîfeyê yekem ê Mewlana Xalid e.²⁹

Bi vî rengî mirov dikare bêje ku Şêx Nûrî bi riya Şêx Muşerref, him digihê Şaxa Basretê him jî ya Tewîleyê. Lê hêjayî gotinê ye ku Şêx Nûrî wek nîspet zêdetir bi ser Şaxa Tewîlê ye ku di xutbeyên xwe de jî ewilî vê şaxê û şêxên xwe yên di vî sîsileyê de pişt re şaxa Basretê û şêxên di vê sîlsileyê de tîne ziman.

Şêx Nûrî, di helbestên xwe de jî dilsozî û endambûna ji bo terîqeta xwe tîne ziman.

Terîqa Neqşebendî daruwê her derd û her janan

Ji bêhna nisbeta wî her kesek reqsî di cezbê da

(Q. 1 / 18)

²⁷ Sadînî û Doskî, h.b., r. 16.

²⁸ Basret, yek ji çar şaxên sereke yên Xalidîtiyê ye. Basret navê gundekî ye ku berê bi Eruhê ve niha jî bi Şîrnexê ve hatiye girêdan. Şaxa Basretê ya Xalidîtiyê ji aliyê Şêx Xalidê Cizirî ve (k.d. 1839) ku xelîfeyê dawî yê Mewlana Xalid e, li vî gundî hatiye avakirin. Ji helbestvanên ku bi şaxa Basretê ve girêdayî yên herî zêde balê dikşînin helbestvanên malbata Aqtepê ne ku ew jî; Şêx Ebdurehmanê Aqtepî(k.d.1907), Şêx Mihemed Can (k.d. 1909), Şêx Mihemed Kerbelayî (k.d. 1939), Şêx Mihemed Eskerî (k.d.1952) û Şêx Hesîp (k.d.1947) in. (Bnr., Abdurrahman Adak, "Serdema Xalidîtiyê di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîk de", Kürt Tarihi, h. 30. r. 62-63.)

²⁹ Sönmez, h.b., r. 11.

Ji des wî xweşhuner derket çî îman û fiqir ser ket

Terîqa Neqşebend ber ket çî agir kir di qelbê da

(Q. 1 / 20)

1.7. Berhemên Wî

Şêx Nûrî; bi erebî, tirkî, farisî û kurdî baş dizane û kariye bi van zimanan berheman bide. Xwe bi zimanekî sînordar nekiriye. Him berhemên menzûm nivîsîne him jî yên mensûr. Bi tevahî xwedanê neh berheman e. Tevî ku bi latinî zaniye jî berhemên xwe yên bi tirkî bi vê alfabeyê nenivîsîne, wî berhemên xwe yên bi tirkî bi osmanî nivîsîne ku ev jî yek ji taybetmendiyên wî ye; lewra piştî avakirina Komara Tirkiyê di yekê Mijdara sala 1928an de, di hemû waran de şûna alfabeya erebî êdî alfabeya latinî dikeve rewacê. Lê Şêx Nûrî, li ser kevneşopiyê çûye û berhemên xwe yên bi tirkî bi osmanî nivîsîne. Lê hin ji van berheman hatine latînezkirin.

1.7.1. Berhemên Wî yên Menzûm

1.7.1.1. Dîwan

Dîwana Şêx Muhemmed Nûrî, ji helbestên wî yên bi erebî, tirkî û kurdî pêk tê. Di nusxeya li ber destê me ya Dîwanê de, bi tevahî 38 helbest hene. Ji van helbestan 19 heb bi kurdî, 16 heb bi erebî û 3 heb jî bi osmanî(tirkî) ne. Bi gotineke din Şêx Nûrî, zêdetir helbestên xwe bi kurdî nivîsîne ku ev jî girîngîdayîna wî ya bo kurdî nîşan dide. Hemû helbestên di Dîwana wî de; ji qesîde, murabbe' mesnewî û ji yekmalikan pêk tên. Lê piraniya wan qesîde û merebbe' ne. Ev berhem mijara teza me ye û em ê him ji aliyê şiklî ve him jî ji aliyê naverokî ve bi berfirehî behsa wê bikin. Lê mijara teza me ne tevahiya Dîwana wî ye em ê bi tenê li ser helbestên wî yên bi kurdî bisekinin. Lê di cihên hewce de wê agahiyên li ser hemû Dîwanê jî bên dayîn.

1.7.1.2. Mewlid³⁰

Yek ji berhemên din ên girîng ên Şêx Nûrî, mewlûda wî ya bi kurmancî ye ku behsa Hz. Mihemed û jidayîkbûna wî dike. Ev berhem ji 178 beytan pêk tê û wek taybetmendiyeke mewlûdan bi terzê mesnewiyê hatiye nivîsîn. Berhem ji 8 mebhese(beş) û ji qisma xatîme-duayê pêk tê. Lê sernavên mebhesan ne bi kurdî bi erebî hatine nivîsîn ku bi kurdî mirov dikare wisa rêz bike.

1. Mebhese Xwendina Mewludê
2. Mebhese Destpêka Afirandinê
3. Mebhese Nesebê
4. Mebhese bi Kurtasî Behsa Hin Mucîzetan
5. Mebhese Hemlebûnê
6. Mebhese Jidayîkbûnê
7. Mebhese Teşrîf û Zuhûrê
8. Mebhese Şîrdayînê

Her du beytên ewil yên mewludê bi vî rengî ne:

We be'du seh ke ji min nezmek sehîh û temîz
Bizubdeti'l mewalîd nav e merdê ezîz

Seb qisseta mewlida xeyru'l ware ebedî

Îhsan diket kereman bo aşîqê semedî³¹

Her du beytên dawî yên qisma xatîme û duayê ji bi vî rengî ne:

Evan reşand dînê îslamê bi şîr³² û qelem

Rehnî kirin her teref ereb we rom û ecem

³⁰ Di kurmanciyê de wek îmla peyva “mewlid”ê bi rengê “mewlûd” tê nivîsîn. Lê ji ber ku Şêx Nûrî wek “Mewlid” nivîsîye me jî wisa da.

³¹ Molla Muhemmed Nûrî, *Istîxasat 'ul- Mecmû'etî'n-Nûrîyye fî ma Yet'elleq bî Xeyrî'l- Berriyye*, cihê çapkirinê û navê weşanxaneyê nîne, 2016, r. 6.

³² Bi şîr yanî.

Bo me muyesser ke ser teqwaê dîn bi xitab

Salim ji kullî belan El fatîha tamam³³

Her wiha di dawîya mewlûda wî de, helbestek jî cih digre ku ew di nusxeya Dîwanê ya li ber destê me de nîne. Navê helbestê “Ji bo xwediyê mewlûdê ye” û bi terzê qesîdeyê hatiye nivîsîn. Em ê vê helbestê jî di beşa Metnê Dîwanê de bidin.

Ev berhem di sala 2016an de bi herfên erebî hatiye çapkirin.

1.7.1.3. Nehcu'l Enam et-Turkî Fî 'Eqîdetî Ehlî's-Sunnetî ve'l-Cema'etî

Ev berhem wergera bo tirkî ya Nehcu'l Enama Mela Xelîlê Sêrtî(1754- 1843) ye ku wek berhemeke dînî-dîdaktîk hatiye nivîsîn. Her wiha yek ji wan berhemên kurdî ye ku li medreseyên kurdan heta niha jî ji bo perwerdeya feqîyan tê xwendin. Şêx Nûrî, ev berhema ku ji 22 beş û 271 beytan pêk tê bi awayekî menzûm wergerandiye tirkîya osmanî. Lê di wergerê de ji bo hevsengîya weznê bêyî ku maneya eslî ya metna esas biguhere, hin peyvên ku di metna kurdî de derbas nabin jî lê hatine zêdekirin. Her wiha di hin mebhesan de jî hin beyt nehatine wergerandin. Wekî din Şêx Nûrî hin beş jî li gorî tema û mijara xwe wek binbeş jî dabeş kirine. Ji aliyê şiklî ve jî eslê wê ku bi qalibê erûzê yê fe'ûlûn fe'ûlûn fe'ûlûn fe'ûl hatiye nivîsîn, di wergera tirkî de bi qalibê fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun'ê hatiye nivîsîn.

MEBHESU'L LÎBASÎ

Lîbasê ji bo fexr û kibrê mepoş

Mucerred ji bo ta'etê wî bipoş

Heramî û dîbac û qez ber meke

Bi wan ta'etê xwe tu berze meke!³⁴

³³ Molla Muhemmed Nûrî, h.b., r. 34.

³⁴ Mele Xelîlê Sêrtî, *Nehcul Enam*, Tîpkuheziya ji Erebi: Osman Akdağ, Kerem Soylu, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2002, r. 44.

Wek mînak Mebhesa Nehcu'l Enama Mela Xelîlê Sêrtê ya li jorê ku ji du beytan pêk tê û her misrayeke wê ji 11 heceyan pêk tê, Şêx Nûrî bi vî rengî wergerandiye.

LİBAS BAHSÎ

Fahrü kibrin gayesiyle hiç libası giyme sen

Hâlisân tâatların çün avreti sen örtersin

Giyme sen aslâ harâmı hem de ipek malları

Bunları giymekle zâyi' etme sen tâatleri³⁵

Ev berhem jî di sala 2016an de, him bi herfên latinî him jî bi yên erebî hatiye çapkirin.

1.7.2. Berhemên Wî yên Mensûr

1.7.2.1. 'Ezaimu'l Xeyratî fî Fedâilî'l Te'atî(Di Fezîletên Te'etê de Xêrên Mezin)

Berhemeke dînî û mensûr e. Her çi qas sernavê wê erebî be jî berhem bi kurdî hatiye nivîsîn. Di berhemê de bi gotina Şêx Nûrî; bi ayet, hadîs û kelam û gotinên mezinan, behsa fezlên te'at û îbadetê hatiye kirin. Di berhemê de sernavên wek; Feslê Fezîleta Dînê Îslamê, Feslê Derheqê Kelîma Şehadetê da, Fesla La Îleha illallah, Zikran û Tesbîhan, Fezla Îstîxfar û Tobeê, Duayê Piştî Xwarinê û binbeşên wan hane. Ev berhem jî di sala 2016an de bi herfên erebî hatiye çapkirin.

1.7.2.2. Ümmete Hidmet Risalesi(Rîsaleya ji bo Xizmeta Ummetê)

Yek ji berhemên din ên bi hecm ên Şêx Muhemmed Nûrî ye. Wek berhemeke dînî ye û bi awayekî mensûr bi tirkiya osmanî hatiye nivîsîn. Di pêşgotina berhemê de Şêx Nûrî diyar dike ev berhem bi taybet ji bo perwerdeya zarokan û hînkirina malûmatên dînî yên ji bo wan hatiye nivîsîn.

³⁵ Mele Xelîlê Sêrtî, Nehcu'l Enam(Nehcu'l- Enam et-Turkî Fî 'Eqîdetî Ehli's-Sunnetî ve'l-Cema'etî), (Wer. Şêx Muhemmed Nûrî), cihê çapkirinê û navê weşanxaneyê nîne, 2016, r. 41.

Di berhemê de behsa Hz. Mihemed, malbata wî, çar xelîfe, hin alimên mezin, gelek mijarên edebê, zirara tiştên wek; xeberdana zêde, xwarina zêde, derewkirin û qiyametê û hwd. hatiye kirin. Ev berhem jî ku ji 336 rûpelan pêk tê di sala 2016an de bi osmanî hatiye çapkirin. Her wiha hatiye latînezekirin jî.

1.7.2.3. Bostanu'l 'Arifîn

Di vê berhemê de kurtejiyana bav û birayên xwe nivîsiye. Her wiha nameyên ku bav û birayên wî ji bo wî bi rê kirine, di vir de kom kirine. Berhemeke bi erebî ye.

1.7.2.4. Keşkul

Şêx Nûrî, ev berhem jî derbarê wan meseleyên di dema feqîtiya xwe de nivîsîne ku wek bi feyde hesibandiyê. Ev berhem jî bi erebî hatiye nivîsîn.

1.7.2.5. Nezmû Derarî fî Mehasinî Berwarî

Di vê berhemê de Şêx Nûrî, behsa menqibeyên alimên ku li Berwariyê jiyane dike.

1.7.2.6. Wergera Nefahatu'l Uns

Şêx Muhammed Nûrî, ev berhema bi farisî ya Molla Camî(1414-1492) ku behsa tesewuf û menqibeyên ewliyayan dike, bo kurdî wergerandiye. Di berhemê de behsa tesewufê tê kirin.

BEŞA DUYEMÎN

KESEYATIYA WÎ YA EDEBÎ

2.1. Zimanê Wî

Şêx Muhemmed Nûrî xwe baş perwerde kiriye û kariye bi çar zimanên wek; kurdî, erebî, tirkî û farisî berheman bide û helbestên binivîse. Ew bi rengekî baş waqîfî van zimanan e û lîteratûra wî ya dîyalektên kurdî û peyvên gelek berfireh e.

Di helbestên xwe yê bi kurdî de, ji gelek aliyan ve ziman û uslûbeke bi hêz û rengîn bi kar anîye. Hinek jî bi tesîra heyama xwe, di çarçoveya edebiyata klasîk de, zimanê helbestên wî ne girîf e, sade û zelal e. Bi taybet zimanê helbestên wî yê dînî-dîdaktîk, li gorî helbestên wî yê din di hin ciyan de gelek sadetir û siviktir e. Her wiha fêmkirina wan jî rihetir e. Lewra Şêx Nûrî dixwaze bi vî rengî mebesta xwe bide diyarkirin.; lê him wek kevneşopîyeke edebiyata klasîk him jî ji bo ku wek peyrevêkî tesewufê ye û him jî ji ber perwerde û endambûna wî ya medreseyê, di helbestên wî yê bi kurdî de, gelek peyv û unsûrên erebî jî cih digirin.

Ji aliyekî din ve, ji ber ku ew him Botî ye him jî demeke dirêj li deverên Bahdînanê yê Wan û gundên wê maye, di helbestên wî de tesîra devoka Botî û Bahdînî jî bi awayekî eşkere xuya dibe. Lê Şêx Nûrî, xwe bi tenê bi van devokan sinordar nekiriye, formên devokên din jî di helbestê wî de xwe diyar dikin. Her wiha di seranserê helbestên wî de; ravekên şêlû û dirêj jî zêde cî nagirin.

Cemî'ê qaz û qumrî rakirin reqsê şetê carî

Bi her 'ezmanekî şukrê diken hev ra di reqsê da

(Q. 1 / 4)

Ji mehbûb dûr kirim îro felek zalim ji min bes ke

Te mêlaka mi ker ker kir ji min bes ke ji min bes ke

(YM. 1 / 1)

Quwwet û taqet nema yek car me winda kir su'ûd

Çare û hêvî nema winda bû nûra hikmetê

(Q. 4 / 4)

Ey pişteka van ‘asiyan
Ey murşidê Berwariyan
Derman bike van naliyan
Ey dergehê rehma Xuda

(M. 2 / 4)

Wek me li jorê jî diyar kir zimanê hin helbestên dînî-dîdaktîk yên Şêx Nûrî gelek sade û siviktir in.

Qusûrê hev nenêrin hûn tu caran
Neken şerha nebaş lefza hevalan

(Q. 14 / 44)

Edeb dîn e edeb ‘ilm e edeb esl
Edeb nûr e edeb her husn e ‘alan

(Q. 14 / 24)

2.1.1. Taybetiyên Devoka Botî û Hekkarî

Şêx Nûrî, ji xelkê Perwariya Sêrtê ye û devoka wî Botî ye. Her wiha demeke dirêj li Payîzavaya Wanê û gundên wê muderîstî û meletî jî kiriye ku wek ziman û erdîgarî dikevin herêma Bahdînan. Him ji ber van xalan him jî ji bo ku piraniya berhemên klasîk ên kurdî wek standardîzasyon bi van devokan hatine nivîsîn û Şêx Nûrî ev berhem xwendine, ev yek jî bi awayekî xwezayî tesîr li zimanê wî kirine. Em ê van taybetmendiyên li xwarê îzah bikin.

Di devoka Botî û Bahdînî de, di kişandina kesê sêyem de; pêveberên wek; bibin, dibin, dikan, nakin, di van devokan de dikevin formên wek; bibit, dibit, dikit, diket. Di seranserê helbestên Şêx Nûrî de ev reng xwe diyar dike. Lê di murebbe’yên wî de ev reng zêde xwe diyar nake.

Her yekî digrî **diket** hesret heta sê roj تمام
Dê **bibit** ez dê bikêşim ta qiyamet hesretê

(Q. 4 / 12)

Heyfa vî ‘umrî ezîz çawan **dibûrit** bê xebat
Heyfa zarê ‘aliman dibne hevalê qeşmeran

(Q. 11 / 1)

Ne me‘qul e **nekevte** taê, yê yekcar nezer lê kir
Neke bawer **bibîte** hakimê xwe ew di gavê da

(Q. 1 / 17)

Nûrî **diket** zarî hewar
Qet’a nema sebr û qîrar
Eslah biken vê nefse har
Ey dergehê rehma Xuda

(M. 2 / 13)

Şêx Nûrî, formên kişandî yên wek; dikim, bike, bide neke, nekin, bide, çêke
wek taybetmendiyêke devoka Badînî di formên wek; dikem, bikey-ke, bidey, neken,
nekeyn, çêkey de, nivîsine.

Ji bo me tu **bidey** destûr j’ me ra qelban **bikey** me‘mûr
Tu Şêxê me **bikey** mensûr di her ewqat û anê da

(Q. 1 / 24)

Ji lutfa te **diken** daxaz û zarî
Tu her me **çêbikey** der kullî halan

(Q. 14 / 62)

Babê Şifa nûra Xuda
Her çî ku girt û berneda
Ew dê bigehte meqseda
Qesem **dikem** Babê Şifa

(M. 3 / 4)

Seba hev qet neken ew pur xirab e
Tu car ifşa **neken** ‘eyba hevalan

(Q. 14 / 45)

Ji bo wî milletan **çêkey** tu îmdadê gelek rê **key**
Bu wî Rewza Medînê key qewî **key** wî di ‘erdê da

(Q. 1 / 27)

Di devoka Botan û Hekariyê de navê Xwedê/Xweda bo forma Xuda hatiye emilandin.³⁶ Şêx Nûrî jî di navê Xwedê de, di helbestên xwe de bes ev form bi kar aniye.

Her yekî ew dê biçî keyfxweş bibî lê ez tinê

Mam di vê kerbê mudamî ya **Xuda** dey taqetê

(Q. 4 / 15)

Ez nizanim qîmeta wî ya **Xuda** ihsan bike

Lew li nik te ya îlahî ew bi qedr û qîmet e

(Q. 8 / 4)

Ey pişteka van ‘asiyan

Ey murşidê Berwariyan

Derman bike van naliyan

Ey dergehê rehma **Xuda**

(M. 2 / 4)

Xuda celle j’ me ra tewfîqê daîm

Bikit îhsan neket rûreş tu halan

(Q. 14/ 60)

Di devokên Bahdinî û Botî de, daçekên wek; “çimkî”, “bi hev re” di formên wek; çikû, li nik û digel tên îfadekirin.

Xuda her nazirê qelban e daîm

Çi ya hatî, **li nik** wî kifş e ‘alan

(Q. 14 / 56)

³⁶ Sönmez, h.b., r. 16.

Ji bona xizmetan hazir we hiş bin

Li nik wî qet nebin xerqê mitalan

(Q. 14 / 32)

Tu hifiz ke cumle ewladê ewî hemyan tamam

Hem **digel** talûq evînan me **digel** be cennetê

(Q. 4 / 35)

Edeb zehf in bi hejmar nayte îmkâ

Çikû bê wê nihin tu tişt tu halan

(Q. 14 / 25)

Her wiha gelek îfadeyên din yên van her du devakokan di helbestên wî de peyda dibin.

Ey tebîbê her birînan **rehnîya çehvê** evînan

Şahiya qelbê hezînan şeyxê ser kehnî meded

(Q. 3 / 4)

Tu bikey îmanê kamil her **xweyîti** tu l'me key

Lew ji me setand te **xweyê** me ey **xudanê** rehmetê

(Q. 4 / 11)

Ey du **çehvê** min birêje hêstirê **xûnê** dewam

Ku xezînê 'ilm û 'irfan bûne sandûqê peran

(Q. 11 / 4)

2.1.2. Taybetiyên Devoka Serhedê

Xusûsiyeteke sereke ya devoka Serhedê ew e ku di gelek peyvên de dengê “w”yê nayê gotin. Hetta, di gelek ciyan de meriv dikare bêje ku ev deng qet tine. Bo nimûne: Ûsa(wisa), alat (welat), xaş (xweş), xarin(xwarin), çanî(çawanî) û hwd.³⁷ Di helbestên Şêx Nûrî de jî mînakên vê taybetmediyê peyda dibin. Wek nûmûne di van malikên jêr de dengê “w”yê nîne.

³⁷ Önder Beyter, “*Dîwana Mele Ehmedê Heyderî -Metn û Lêkolîn-*”, (Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2013), r. 24.

Em dikeyn hêvî **dixazîn** rehm û ihsanê Xuda
Tu bike rehmê îlahî ser ‘iyalê zilletê

(Q. 4 / 17)

Ya ilahî em nezanîn çî **bixazîn** çî bikeyn
Lew ku xalib di me da heywanî û hem wehşet e

(Q. 8 / 16)

Sifre û dana ewî mexlûqê ‘alem jê **dixar**
Teyr û tûr jê ra dikalîn vê ‘ecêba hikmetê

(Q. 4 / 27)

Wek ney û nayê dibêjîn hêstirê **xûnê** dirêjîn
Şubhê perwanê disojîn guh ker e ‘ezman me lal e

(Q. 2 / 4)

2.1.3. Peyvên Xwerû yên Kurdî

Şêx Nûrî, di helbestên xwe de gelek peyvên resen ên kurdî jî bi kar anîne. Her wiha hin caran peyvên soranî jî emilandine.

(Rênas, nûjen, havîn, rengîn, jan, xweşhuner, agir, mêlak, tebat, ezman, evîn, gulav, dilbilav, ziringi, bar, piştêk, keyfxweş, bêkes, dem, dijwar, diltûrbirîn, pişt, jehr, welat, sorgul, xemrevîn, hinav, xunav, dilriz, pist û sist, vejand, kul, nivîşt, nivîn, dîk, neyar, sergerm.)

2.1.4. Unsûrên Erebî, Farisî û Tirkî

Edebiyata klasîk a Rojhilat ku edebiyata kurdî ya klasîk jî perçeyekî wê ye; ji aliyê ziman, teşe û uslûb ve ne edebiyateke yekreng e; wek edebiyateke pirreng derdikeve pêş. Gelek millet, ziman û kultûr bi rengê xwe têkelî hev bûne û belkî vê yekê herî baş xwe li ser edebiyata klasîk îfade kiriye. Di vê çarçoveyê de edebiyata klasîk ya kurdî jî him ji aliyê zimên ve him ji aliyê tema û mazmûnan ve û him jî ji aliyê teşeyê ve gelek di bin bandora edebiyat û zimanê erebî û farisî de maye. Lê bi taybet ziman û edebiyata erebî zêdetir tesîr lê kiriye. Lê ev ji bo ziman û edebiyata kurdî nebûye wek astengekê. Şair û edibên kurd li peyv û qalibên van zimanan, rengêkî kurdî zêde kiriye û bi vî rengî berhem nivîsîne. Di vê çarçoveyê de em ê jî li

xwarê wek beş bi beş nîşan bidin ev ziman û edebiyat bi rengêkî û çawa di helbestên Şêx Nûrî ên bi kurdî de, ji xwe re cih girtine.

2.1.4.1. Unsûrên Erebî

Edebiyat û zimanê kurdî jî wek gelek edebiyat û zimanên milletên cîran û misilman, bi sedan salan di bin tesîra ziman, têgeh û qalib û cureyên edebî yên erebî de mane ku ev renk bi awayekî eşkere bi taybet xwe di edebiyata klasîk de diyar dike. Şêx Nûrî jî him wek endamekî medereseyê ku pîranî erebî lê tê xwedî him jî di çarçoveya bîr û baweriya xwe de gelek; peyv û qalibên erebî bi kar anîne. Ji xwe jî 38 helbestên wî; 16 heb bi erebî ne ku ev yek jî him tesîra erebî ya li serê him jî zanebûn û hostetiya wî ya erebî nîşan dide. Em ê li xwarê hin peyvên erebî ku di helbestên wî yên bi kurdî derbas dibin, bidin. Lê hêjayî gotinê ye ku ev peyvên ku bi kar anîne ji nav civakê jî zêde ne dût in, bi gotineke din ne peyvên pir xerîb in.

Kewkeb: Stêrk

Extiyar: Kalbûn

Eyş: Jiyan

Hub: Evîn

Mensûr: Serketî

Nar: Agir

Nîda: Bang

Dewa: Derman

Burq: Birûsk

Hucûm: Êrîş

Kenz: Gencîne

Eta: Dayîn

Nuqtek: Dilopek

Wech: Rû

Fereh: Keyf û şadî

Asiyan: Gunehkaran

Seqîm: Nesax

Izal: Bêderman

Muqeddes: Pîroz

Fecar: Berbang – Şefeq

Elem: Êş – jan

Kelam: Peyv – gotin

Xalî: Vala

Feyaz: Çavkanî

Sîma: Bihîstin

Sîkyan: Kêr

Ewla: Yekem – yekemin

Bezekî: Hindikî

Exleb: Pîranî

Zenb: Guneh

Îhya: Vejîn

Yumn: Rastbûn

Lefz: Peyv	Mesrûr: Kêf û şadî
Meqal: Gotar	Nazir: Çav lê – lê dinêhre
Ifşa: Aşîkar	Eswa: Pîs
Mislê: Wek	Îhsan: Qencî
Webalan: Belayên mezin	Etrafan: Kenaran – kêlekan
Lîbasan: cil û kinc	Lehzek: demek pir kurt – xulek

Di helbestên wî yên bi kurdî de, ji xeynî ravekên erebî, dîsa ji peyvên erebî bi forma kurdî gelek ravek jî cih digrin.

Kullî halan	: Di her rewşekê de, di her halekî de
Sahib kemalan	: Îsanên gihîştine meqamên bilind
Cenneta Firdews	: Yek ji mertebeyên cennetê ye
Sebr û Hilim	: Sebr û helîmbûm
Cumle ewladê	: Hemû zarokan
Alî meqam	: Kesê/a ku meqamê wî/wê bilind
Weqar û heybet	: Bi rûmet û heybet
Efdelê ‘alem	: Di alemê de kesê bi fazîlet
Le’b û lehû	: Lîstik û karên vala bê qîmet
Qesra Cebar	: Mala Xweda
Sahib Kerem	: Xudanê keremê
Xeyrê kelam	: Mebest jê Qur’an e
Darusselam	: Cihê saadetê, cennet
Behra fikr û hîre	: Deryayên raman û hîretê
Xewsê kamil	: Şêxê mezin û gihîştî meqamên bilind
Behrekê ‘ilm û me’anî	: Deryayek ji zanîna û merîfetê
Şeyxê ekber	: Şêxê herî mezin
Muhîbek sadiq	: Evîndarekî/e dilsoz

2.1.4.2. Unsûrên Farisî

Ziman û edebiya farisî jî wekî ya erebî çavkaniyeke edebiyata klasîk a kurdî ye. Peyv û îfadeyên farisî, hinek têgehên edebî û teşeyên nezmê ji edebiyata farisî

derbasî edebiyata kurdî ya klasîk bûne.³⁸ Di helbesêtên Şêx Nûrî yê bi kurdî de, gelek kêmbê jî hin caran peyvên farisî jî cih digrin. Her wiha gelek peyvên hevpar yê kurdî-farisî jî hene.

Ey reva cumle murîdan rehnîya **ceşmê** se'îdan

Melhema qelbê reşîdan şeyxê ser kehnî meded

(Q. 3/7)

Ji bona ta'etan wek **pehlewanan**

Ji bo tiştê heram dûr bin bi salan

(Q. 14/18)

Hin peyvên din jî bi vî rengî ne:

(destegîr, xanedan, pehlewanan, pervane, purxem, şehsuwar, dergah, taban, mahitab)

2.1.4.3. Unsûrên Tirkî

Şêx Muhemed Nûrî, di hin hebestên xwe de peyvên tirkî jî bi kar anîne. Lê ew jî bi tenê di nava çend beytan de bikaranîna du peyvên tirkî ye. Ev jî bi wê wesîleyê ye ku her çî qas kurd wek siyasî û ziman di bin desthilatdariya tirkan de mabin jî di çarçoveya edebiyata klasîk de tirkî wek erebî û farisî nekariye tesîrê li edebiyata kurdî ya klasîk bike.

Emek ya 'ilm û teqwa ye bizanin

Ne ku bej ji bo pîsîtiyê kalan

(Q. 14 / 51)

Emek: Ked, xebat, xeyret,

Çî bêjim ez çî kem feryad û zarî

Dilan **yexme** diket Şeyxê Xinûkê

(Q. 7 / 7)

Yağma: Talan, wêran,

³⁸ Doç. Dr. Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiya Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2014, r. 41.

2.1.5. Hunerên Edebî

Di fêmkirin û nirxandina metneke edebî û bi taybet di çarçoveya edebiyata klasîk de, hunerên edebî cihekî girîng digrin. Ev huner, him vegotinê xurtir dikin û him jî qiymeta helbestekê bilindtir dikin. Em ê di vê beşê de ne ku hemû mînakên tespîtkirî bidin, em ê bi giştî ciwankariyên ku di Dîwanê de hatine tespîtkirin bi mînakan bidin. Lê hêjayî gotinê ye helbestên wî yê dînî-dîdaktîk li gor yê din kêmtir hunerên edebî di xwe de dihevin ku ji xwe ev jî taybetmendiyeke helbestên bi vî rengî ye.

2.1.5.1. Teşbîh

Du tiştên ku di navbera wan de peywendî hebe û ji van tiştan ya qels bi ya ji xwe qewîtir bê şibandin hunera teşbîhê derdikeve holê.³⁹ Di şibandinê de daçekên weke “ mîna, wekê, şibhê, şuhbetê, teşbîhê, mislê, mîsalê tene bikaranîn.⁴⁰

Me nema sebr û qirarek lew di dil da pêt û narek
Dil yeqîn sohtî bi carek lew ku ez bûm **şubhê dal e**

(Q. 2 / 6)

Kanî gelo keyfa berî
Ka ew civata şekerî
Mam **mislê teyrê bê serî**
Babê feqîran ka gelo

(M. 2 / 5)

Ji bona xizmeta wan mislê şêr bin
Xwe sist û pist neken **mislê betalan**

(Q. 14 / 47)

Di mînaka yekem de şair bi êşa dilê xwe halê xwe şibandiye herfa dalê ku di nivîsê de herfeke xwar e. Wekî tê zanîn herfa dalê ‘eczîyetê jî temsîl dike. Di mînaka duyem de, ji aliyê ku bêkes maye û nikare pêşiya xwe bibîne rewşa xwe şibandiye

³⁹ Hayrullah Acar, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr –Metn û Lêkolîn-*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2016, r. 65.

⁴⁰ Muslih Sezer, *Dîwançeya Seyfîyê Şoşî (Metn û Lêkolîn)*, (Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2016), r. 32.

teyrê bê serî. Nivîskar di vê mînakê de jî bi riya edata teşbîhê huner çêkiriye. Di mînaka sêyem de ji aliyê ku bi kêrî tiştêkî nayên wek muşebbehun bîh (aliyê ku tê şibandin) “betal” hatiye bikaranîn. Nivîskar bi alîkariya daçeka “mislê” hunera teşbîhê çêkiriye.

2.1.5.2. Telmîh

Bûyereke ku ji terefê gelean ve bê zanîn, şexsekî/ê tarîxî, mirovekî/ê, gotineke pêşyan ger di nava helbestek de derbas bibe jê re hunbera telmîhê tê gotin.⁴¹ Bi qasî ku me tespît kir Şêx Nûrî ev huner du caran emilandiye lê bes di beytekê de

Şifa bû tali'ê weqtê Mesîh 'Îsa ji jor da hat
Ji lew rabûn mirî weqtê ku wî yek car nezer lê da

(Q. 1 / 11)

Di misraya ewil de, ji bo wê baweriya ku Hz. Îsa derketiye asîmanan, di ya duyem de jî dîsa ji bo mucîzeyê Hz. Îsa ku mirî ji qebrê rakiribûn, telmîh hatiye kirin. Bi riya vê qîseyê helbestvan xwe ji vegotîneke dûdirêj xelas kiriye û mebesta dilê xwe bi alîkariya vê hunera navdar aniye ziman.

2.1.5.3. Teşxîs

Heke taybetmediyeke însanan çî zindî çî ne zindî li tiştêkî derveyî însanan bê barkirin, wê demê teşxîs pêk pê.

Ey dilê kor û nezana rabe ser xwe bifkire
Lew ji bo te ev di îro tali' û xweş furset e

(Q. 8 / 13)

Xilas key me ji nefsa har û zalim
Bidey ber purleya sahib-kemalan

(Q. 14 / 65)

Di beyta yekem de dîsa taybetmediyeke însana “kor û nezani” li dil hatiye barkirin. Wekî tê zanîn çavên dil ne mumkun e ku hebin û her weha dil nikare bibe zana an nezan. Ji ber ku nivîskar şibandineke bi vî rengî çêkiriye em dikarin bibêjin

⁴¹ Acar, h.b., r. 67.

ku ev hunera teşxîsê ye. Di beyta duyem de jî “har û zalimbûn” wek taybetmediyeke nefsê hatiye nîşandan lê belê nefsi bi xwe nikare wan taybetmendiyên (har û zalim) di xwe de bihewîne.

2.1.5.4. Tenasûb

Bêjeyên ji heman malbatê an jî bi hev re têkildar, dema di heman beyit an qite an jî bendê de werin bikaranîn wê demê hunera tenasûbê çêdibe.⁴² Şêx Nûrî jî di helbestên xwe de serî li vê hunerê daye.

Binefs û nêrgizan hev ra çî **bêhn** berdane van **baxan**

Gula sor û temamê **çiçek** xweş kenîn pê da

(Q. 1 / 7)

Tu bipirse j’van **yetîman** van **xerîb** û **bêkesan**

Da beyan ken wan ji dest çû îro nûra dewletê

(Q. 4 / 26)

Me ji dergahê hebîb navê tu caran û deman

Me hişîn ke tu ji bo xwe j’ **lutf** û **fedl** û **rehmetê**

(Q. 4 / 37)

Di beyta yekem de tê dîtin ku nivîskar bi riya gul û cureyên wan û tiştên bi wan re têkildar (bêhn, bax) hunera tenasûbê çêkiriye. Di beyta duyem de dîsa bi riya bêjeyên “xerîb, yetîm û bêkes” hunera tenasûbê heye ku ev bêje ji aliyê wateyê ve bi hev re eleqedar in. Di beyta sêyem de jî nivîskar, behsa “rehmet, fedl û lutfê Xwedê dike. Wekî tê zanîn ev bêje jî ji aliyê wateyê ve bi hev re têkildar in.

2.1.5.5. Tezad

Ji hêla wateyê ve eger du xeyal, fikr û hestên dijber dema ku bi hev re tînin bikaranîn jê re hunera tezatê tê gotin. Teqez divê di navbera têgehên dijber de peywendî û xalên hevbeş hebin.⁴³

⁴² Aynur Ili, *Hunerên Edebî di Dîwana Hadî*, (Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2019), r. 56.

⁴³ Acar, h. b., r. 73.

Çiraê dînê îslamê kire rehnî derê tarî

Cuwan bûn **extiyar** îro mirî rabûn di qebrê da

(Q. 1 / 12)

Te dikir **derman** di gavê, **derdê bê derman** bûya

Rehm û ihsan ya Xuda bû, lê tu bû bêşik sebeb

(Q. 6 / 7)

Ey rehnîya misk û gulav

Ey rehmeta rehnî xunav

Derman bike **derdê** hinav

Ey dergehê rehma Xuda

(Q. 8 / 8)

Di beyta ewil de, “cuwan” wek sal bi zidê xwe bi “extiyar” re hatiye bikaranîn û bi vî awayî hunera tezdê hatiye çêkirin. Di vê mînakê de her du bêje (ciwan û extiyar) ji bo dijberiyê bi hev re hatine bikaranîn. Di beyta duyem de, di navbera derd û derman de tezdad heye. Di mînaka sêyem de jî disa derd û derman wek ziddê xwe hatine bikaranîn.

2.1.5.6. Muqabele

Ger di îbareyekê de piştî du yan zêdetir bêjeyan, di heman rêzê de bêjeyên muqabilî yan ziddê wan hebin ji vê yekê re muqabele tê gotin.⁴⁴ Lê dijberiya di vir de ne ji bo tezdadê tê bikaranîn.

Hilavêt roj ji Berwarî çî şewqek pur ‘ecêb lê da

Şev û roj bûne wek hev tev kirin rehnî di gavê da

(Q. 1 / 1)

Em **diçin-tên** bê tebat in digirîn guhdar tunîne

Wek ney û nayê dibêjîn **subh** û **êvar** nalenal e

(Q. 2 / 3)

Muhemmed ‘illeta darû Muhemmed

Muhemmed **derd** û **derman** e Muhemmed

(Q. 9 / 3)

⁴⁴ Prof. Dr. M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi Belegat*, 3F Yayınevi, İstanbul 2007, r. 164.

Di mînaka ewil de piştî “şevê” zidê wê “roj” hatiye. Di vê mînakê de di navbera bêjeyên şev û rojê de dijberî tune. Yanî ev bêje ne di wateya tezdê de hatine bikaranîn. Ji bo ku hev temam bikin li pey hev hatine bikaranîn. Di mînaka duyem de li pey “subhê” peyva “êvarê” cih digre, ev mînak jî wekî mînaka ewil e. Subh û êvar ji bo hev temam bikin û giraniyekê bixin nav beytê bi hev re hatine bikaranîn. Di mînaka sîsiyan de jî piştî “derd”ê wek bereksê wê “derman” hatiye bikaranîn. Lê ev dijberî jî ne di çarçoveya hunera tezdê de ye.

2.1.5.7. Nîda

Bi gelemperî ev hunera edebî di destpêka risteyan de wekî denglêkirin xuya dike û ji peyvên baneşînê îstîfade tê kirin. Pirê caran wekî baneşînên “ey, ya, hilo, wax, eywax...” tên bikaranîn.⁴⁵

Ey tebîbê her birînan rehnîya çehvê evînan
Şahiya qelbê hezînan şeyxê ser kehnî meded

(Q. 3 / 4)

Ey reîsê ‘aşîqa[n] **wey hadiyê** me fasiqan
Em ketîne ber şeşan **ey saqiyê** zewq û tereb

(Q. 6 / 3)

Razan bes e **ey bê edeb**
Maye li ser hêvya te reb
Xewa te bo çî ey ‘eceb
Rabe huzûra ta’etê

(M. 4 / 16)

Di beyta yekem de helbestvan bi riya bangkirin û gazîkirinê û bi alîkariya baneşana “ey”ê xwestiye merama xwe bigihîne xwîneran. Di mînaka duyem de jî em rastî 3 nîdayan tînin. Di her sê mînan de jî nivîskar dixwaze gaziya xwe bigihîne muxetabê xwe. Di vê mînakê de nîda bi alîkariya baneşanên “ey û wey”ê hatiye çêkirin. Di mînaka sêyem de jî nîda dîsa bi alîkariya baneşana “ey”ê hatiye çêkirin. Di vê mînakê de nîda wekî hawarekê hatiye çêkirin.

⁴⁵ Acar, h.b., r. 73.

2.1.5.8. Tekrîr

Wek têgeheke belaxetê eger di nav metnekî edebî (misra, beyt yan bendek), yan jî gotarekê de peyv, yan komepeyvêk çendîn caran li pey hev bê dubarekirin ew hunera tekrîrê ye.⁴⁶ Bi saya tekrîrî helbest bihêztir dibe.

Bidey wî zêdetir quwwet **bidey** zatê ewî sihhet

Bidey wî zêdetir qudret di her ‘îş û ‘emalê da

(Q. 1 / 26)

Ji mehbûb dûr kirim îro felek zalim **ji min bes ke**

Te mêlaka mi ker ker kir **ji min bes ke ji min bes ke**

(YM. 1 / 1)

Çi xweş nûr e **çi xweş** saf û zelal e

Çi xweş rehnî didet Şeyxê Xinûkê

(Q. 7 / 1)

Li jorê cihên hatine reşkirin him ji aliyê ruxsarî ve him jî ji aliyê naverokê ve wek hev in û bi vî awayî tekrîr hatiye kirin. Wekî tê zanîn hunera tekrîrê di nav helbestan de ji bo balê li ser cihekî bikşînîn tê çêkirin. Di van her sê mînakên jor de jî bi vî mebestê hin bêje hatine dubarekirin. Di mînaka yekem de bêjeya “bidey”ê, di mînaka duyem de “ji min bes ke” û di mînaka sêyem de jî “çi xweş” çendîn caran hatine dubarekirin.

2.1.5.9. Tesmît

Tesmît di ferhengê de tê wateya aliqandinê. Di belaxetê de dema beytek bibe çar beş, her sê beşên pêşî di nav xwe de bi qafiye bin, beşa dawî jî bi beytên jorê re bi qafiye be hunera tesmîtê derdikeve meydanê. Ji xezel û qesîdeyên ku bi vî şeweyê hatine nivîsîn re jî xezel/qesîdeya musemmet tê gotin.⁴⁷

Terîqa Neqşebendî daruwê her derd û her janan

Ji bêhna nisbeta wî her kesek reqsî di cezbê **da**

⁴⁶ Doç. Dr. Abdurrahman Adak, *Belaxat(Rewanbêji)*, Notên Dersan, Mêrdîn 2017, r. 79.

⁴⁷ Adak, h.b., r. 37.

Çi rehmeq pur mezin **barî** çî rehnî bû dilê **tarî**
Çi Şêx rabû ji **Berwarî** çî îrşad kir ewî tê **da**

(Q. 1 / 18- 19)

Di beytên jorîn de beyta duyem li ser çar beşan hatiye dabeşkirin, her sê beşên pêşî di nav xwe de hemqafiye ne, lê beşa dawî bi beyta ewil ve hemqafiye ye.

Ey tebîbê her **birînan** rehnîya çehvê **evînan**
Şahiya qelbê **hezînan** / **şeyxê ser kehnî meded**

Ey xweyê misk û **gulavan** hafizê van **dilbilavan**
Şafiyê cerg û **hinavan** / **şeyxê ser kehnî meded**

(Q. 3 / 4-5)

Di van her du beytên jorîn de jî heman reng heye. Di vir de jî her sê beşên pêşî di nav xwe de hemqafiye ne, lê beşên dawî yên her du beytan di nav xwe de hemqafiye ne.

2.1.5.10. Îstihfam

Helbestvan ji bo ku hêza bêjeyan xurtir bikin pirsan dikin lê belê ji bo van pirsan tu bersiv ne hewce ye. Matmayinên li hember kes an bûyeran bi riya van pirsan tene îfadekirin. Hunera îstihfamê divê bi cînavên pirsiyariyê yên wek “kîjan, kanî, çima û hwd” çêbibe.⁴⁸

Kanî şeraba xitmeê
Ka şewq û zewqa tobeê
Kanî şemala hucreê
Babê feqîran **ka gelo**

(M. 1 / 7)

Kanî ew we‘z û mesel ah **ka** sebat û ka weqar
Kanî ew îrşad û îslah kanî şerha ayetê

(Q. 4 / 25)

⁴⁸ Ili, h.b., r. 52-53.

Kanî ew zîkr û sulûk ah **kanî** ew Xesxîr Xinûk
Ew şekir şêrîn-xulûk **ka** ey bira Hacî Şerîf

(Q. 10 / 5)

Di mînakên jorîn de helbestvan bêyî ku bi armanca bersivekê hilgire, bi cinavên pirsîyariyên yê; kanî, ka, ka gelo, pirsê dike û bi vî rengî vegotina xwe dewlementir dike.

2.1.5.11. Teraduf (Sînonym)

Teraduf ew e ku du yan çendîn peyvên ku di wateyê de wek hev, lê di form û ruxsarê de ji hev cuda, di nav metnê edebî, yan axaftinê de bi hev re bînan bikaranîn. Ji peyvên bi rengî re peyvên muteradif tê gotin.⁴⁹

Terîqa Neqşebendî daruwê her **derd** û her **janan**
Ji bêhna nisbeta wî her kesek reqsî di cezbê da

(Q. 1 / 18)

Nûriyê dil-tîr-birîn ket ew ji **derdan** û **xeman**
Hem ji bo te ya îlahî ez dikim **hemd** û **senaê**

(Q. 5 / 10)

Ey rehnîya **qelb** û **dilan** ey zakirê zîkrê b' xef
Murşidê cumle murîdan ey şehê 'alî neseb

(Q. 6 / 1)

Di van beytan de peyvên **derd** –jan, **derd** -xem, **hemd**-sena, **qelb**-dil her çî qas wek şekl ji hev cuda bin û ne ji heman zimanî bin jî bi maneya xwe yek in û bi vî rengî hunera teradufê hatiye kirin.

2.1.5.12. Mecaz

Wek têgeheke belaxetê eger peyvek, yan hevokek ne di wateya xwe ya heqîqî de, di wateyê de dî de bê bikaranîn mecaz derdikeve holê. Ji ber ku peyv ji wateya

⁴⁹ Adak, h.b, r. 94-95.

xwe ya heqîqî derdikeve û derbasî wateyeke dî dibe ji bo vî karî peyvya mecazê hatiye bikaranîn.⁵⁰

Bûye fursê neborînê eman xitman neşemrînê
Tu car wîrdan neterkînê **biken agir di qelbê da**

(Q. 1 / 22)

Çimku ew bû **kehniya ava heyatê çikiya**
Xweş- te'am û xweş- şerab bû bona ehlê suhbetê

(Q. 4 / 20)

Ey dergevanê rehmetê
Ey rafî'ê her zehmetê
Qelbê birînê agir ketê
Ey dergehê rehma Xuda

(M. 2 / 11)

Di mînaka ewil de, di rastiya xwe de agir nakeve qelb û agir di wateyeke tesewufî de ye, di mînak duyem de bi qesta “kehniya ava heyatê çikiya” ne avê bavê xwe qest dîke. Di mînaka sêyem de jî dîsa di îfadeya “Qelbê birînê agir ketê” de agir ne di maneya xwe ya rastî de di ya mecazî de hatiye emilandin. Her wiha di heman mînakê de bi qesta “qelbê birînê” ne ku qelb bi awayekî fizîkî birîndar e, qelb bi awayekî ruhî birîndar e.

2.1.5.13. Rucû'

Eger nivîskar/vebêj bi peyvên wek “na, nê, ez xelet im, şaşî çê bû” wek ku dev ji gotina xwe berdide û ji gotina xwe poşman bûye xwe nîşan bide, lêbelê bi gotina peyrew tiştê ku gûya terk kiriye bi hêztir bike hunera rûcû'ê derdikeve meydanê.⁵¹

Zivistan bûye havîn lew feqîr îro diken keyfê
Bihar e **ez xelet bûm** ni'metê havîn ketî tê da

(Q. 1 / 2)

⁵⁰ Adak, h.b., r. 22-23.

⁵¹ Adak, h.b., r. 78-79.

Xweş- çira bû **min xelet kir** roje bû rehnî dida
Xweş bilav dikra bi du caman şeraba muhbetê

(Q. 4 / 21)

Di her du beytên dawî de bi îfadeyên reşkirî helbestvan ji gotin û kiriyara xwe poşman dibe û bi vî wayî rucû' pêk tê.

2.1.5.14. Tarîz

Tarîz ji bo wan îfade û gotinan tê gotin ku bi armanca rexnekirin, henekêxwepêkirin, nîşandana rastiyê ye.⁵²

Heyfa vî 'umrî ezîz çawan dibûrit bê xebat
Heyfa zarê 'aliman dibne **hevalê qeşmeran**

(Q. 13 / 1)

Razan bes e ey **bê edeb**
Maye li ser hêvya te reb
Xewa te bo çî ey 'eceb
Rabe huzûra ta'etê

(M. 4 / 16)

Di mînaka ewil de ji ber ku 'emr bi betalî derbas dibe û zarokên zaneyan ne li gorî dilê wî hereket dikin, bi îfadeya "hevalê qeşmeran" rexneyan li wan digre û bi vî rengî hunera tarîzê çêdibe. Di mînaka duyem de jî ji ber zêde razanê helbestvan rexneyên tund dike.

2.2. Mexlesa Wî

Di edebiyata klasîk de şair, li gorî; mîzac, tebîet û zewqa xwe ji xwe re navekî hildibêjere û vî navî di helbestên xwe de bi kar tîne. Bi vî rengî diyar dibin ku ew helbest yên wî ne û piranî di beyta dawî ya helbestan de cih digrin.⁵³

Şêx Nûrî, di helbestên xwe yên bi kurdî de, 4 mexlas bi kar anîne ku her 4 jî navê wî bi xwe ne; lê bi formên cuda. Yek ji mexlesan "Muhemmed Nûrî" ye, yek

⁵² Saraç, h.b., r. 145.

⁵³ M. Halil Erzen, *Diva Şiirinde Mahlas Kullanma Geleneği ve Bu Geleneğin Modern Şiire Yansıması*, *Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi*, h. 59, r. 43.

“Nûrî Muhemmed” e, yeke din jî “Muhemmed” e Ev her sê mexles jî bes carekê emilandine. Mexlesa din jî “Nûrî”ye. Vê mexlasê jî pênc caran bi kar aniye.

Selatan û selam bê hed li ser yarê xwe yê emced

Muhemmed tu birêj bê ‘ed bi al û tabi‘ê wî da

(Q. 1 / 28)

Bes ke **Nûrî** lew xilas nabî evî tehqîk bizan

Melheza halê xo ke ey kûr di behra zulmetê

(Q. 4 / 31)

Nûrî diket zarî hewar

Qet’a nema sebr û qîrar

Eslah biken vê nefsê har

Ey dergehê rehma Xuda

(M. 2 / 13)

Muhemmed Nûriyê ‘asî Muhemmed

Muhemmed hêviya hane Muhemmed

(Q. 9 / 12)

Pê xilas bin xas û ‘am hasil bibin cumle meram

Yek ji wan **Nûrî Muhemmed** ez xulam xwace Huseyîn

(Q. 11 / 12)

2.3. Edîb û Şexsiyetên ku li ser Şêx Nûrî Tesîr Kirine

Bi qasî ku me karî tespît kir Şêx Nûrî, di helbestên xwe de herî zêde di bin tesîra Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û bi taybet di bin tesîra Şêx Muşerref de maye. Em ê li xwarê mînakên van xalan bidin.

2.3.1. Exmedê Xanî

Tesîra Ehmedê Xanî ya li ser Şêx Nûrî, bi awayekî eşkere xuya dike. Bi taybet helbesta Şêx Nûrî ya bi navê “Kanî çiraê milletan” rast e rast di bin tesîra helbesta Ehmedê Xanî ya bi navê “Kanê Muhemmed Beg gelo, kan Padişahê Serhedan” de hatiye nivîsîn.

Benda ewil û ya dawî ya helbesta mezkur a Ehmedê Xanî:

Kanê Muhammed beg gelo
Ka Padîşahê Serhedan
Îro ji dil bigrîn dilo!
Ka Padîşahê Serhedan

Xanî tu ji destan hilîn
Herçen ku zêde dilkul î
Îro bû Mirî sailîn
Kan Padîşahê Serhedan⁵⁴

Benda ewil û ya dawî ya helbesta mezkur a Şêx Muhemed Nûrî jî bi vî rengî ye:

Kanî çiraê milletan
Kanî tebîbê 'illetan
Şehraê pişta min qetan
Babê yetîman ka gelo

Kanî şeraba xitmeê
Ka şewq û zewqa tobeê
Kanî şemala hucreê
Babê feqîran ka gelo

Wek di mînakên li jorîn de jî xuya dibe Şêx Nûrî jî helbesta xwe wek ya Xanî bi şiklê murebbe'yê û bi heman qalibê erûzê nivîsiye û her du jî mersiye ne. Her wiha îfadeyên “kanî-kanê, ka gelo di her du yan de jî bi heman awayî ne û uslûba Şêx Nûrî gelek dişibe ya Xanî.

⁵⁴ Ehmedê Xanî, Ehmedê Xanî Külliyyatı 4 – Dîwan, (Analîz û wêr. Kadri Yıldırım), Avesta Yayınları, İstanbul 2014, r. 202, 208.

2.3.2. Melayê Cizîrî

Şêx Nûrî di bin tesîra Melayê Cizîrî de jî maye. Bi taybet jî ji aliyê şiklî ve tesîra Mela li ser Şêx Nûrî xwe diyar dike.

Her du beytên ewil ên qesîdeya Melayê Cizîrî ya bi navê “Bi narê firqetê sohtim.”:

Bi narê firqetê sohtim ji ferqê ser heta pê da
Xedenga xefletê nuhtim ji berqa lamî'a tê da

Xedenga firqetê re'd e dilê ew xefletê lê dît
Dibêjim wer cebel bit ew bi ker bit wê di gavê⁵⁵

Her du beytên ewil ên helbesta Şêx Nûrî ya bi navê “Hilawêt roj ji Berwarî” jî bi vî awayî ne:

Hilavêt roj ji Berwarî çi şewqek pur ‘ecêb lê da
Şev û roj bûne wek hev tev kirin rehnî di gavê da

Zivistan bûye havîn lew feqîr îro diken keyfê
Bihar e ez xelet bûm ni‘metê havîn ketî tê da

(Q. 1 /1-2)

Wek li jorê xuya dibe Şêx Nûrî jî helbesta xwe bi heman qafiye, paşserwa û bi heman qalibê erûzê ya helbesta Melayê Cizîrî nivîsiye û ev jî tesîra Mela ya li ser wî nîşan dide.

2.3.3. Şêx Muşerref

Wek me li jorê jî diyar kir Şêx Nûrî, bi taybet di bin tesîra birayê xwe Şêx Muşerref de maye ku him li balê ders xwendibû him jî jê îcazeta xwe ya ilmî û terîqetê wergirtibû. Wî jî wek Şêx Muşerref di heman mijar û li ser heman kesan helbest nivîsîne. Her wiha bi gelek aliyan ve terz û îfadeyên wî dişibin yên Şêx Muşerref.

Bi taybet di helbesta Şêx Nûrî ya bi navê “Seceretul Nesaih” de ku mirov dikare wek manzûmeyekê jî qebûl bike, tesîra helbesta Şêx Muşerref ya bi navê “Kitêba Guz û Miwij” bi awayekî eşkere xuya dibe.

⁵⁵ Cizîrî, Mela Ehmedê, *Dîwan(Metnê Kurdî û Türkçe Çevirisi)*, (wer. Osman Tunç), Nûbihar Yayınları, Stenbol 2008, r. 58.

Destpêka helbesta mezkur ya Şêx Muşerref bi vî rengî ye:

Gelî feqyan gelî feqyan nezer kin
Heçî bêjim bizanin hem ji ber kin

Çi kû ez bo we tehqîqa evîn im
Muhîbek sadiq im hem xemrevîn im⁵⁶

Ev jî ji helbesta mezkur ya Şêx Nûrî her du beytên ewil ên qisma muqeddîmeyê ne:

Gelî feqyan gelî cem'a delalan
Dikem qurban ji bo we hal û malan

Ji bo we daîma her ez evîn im
Muhîbek sadiq im her erz û halan

(Q. 14/ 3-4)

Wek di beytên jorîn de jî xuya dibe Şêx Nûrî jî wek Şêx Muşerref bi heman qalibê erûzê û îfadeyan helbesta xwe nivîsiye. Lê bes ya Şêx Muşerref bi terzê mesnewiyê ye ya Şêx Nûrî jî bi terzê qesîdeyê ye.

Dîsa di “fesla qedrê seyda” ya heman helbesta Şêx Muşerref de ev tesîr xwe diyar dike.

Ji helbesta Şêx Muşerref:

Ji bo seyda muheqqeq ferz e îkram
Kesê ku nake îkram naxwe în'am

Ji seyda ger dixwazî îstifade
Divêtin tu bikî bo înqiyadê⁵⁷

Ji helbesta Şêx Nûrî:

Ji bo seyda biken hurmet dewamî
Li nik wî qet nebin sergermê qalan

Çi ya men'a we jê kir qet neken hûn
Di emrê wî bibezne imtissalan

(Q. 14 / 29-30)

⁵⁶ Sönmez, h.b., r. 210.

⁵⁷ Sönmez, h.b., r. 212.

Şêx Nûrî di qesîdeya xwe ya bi navê “Ey su’uda van welatan” de jî gelek di bin tesîra helbesta Şêx Muşerref ya bi navê “Gelek îro birîndar im” de maye.

Her du bendên pêşî yên helbesta Şêx Muşerref:

Gelek îro birîndar im
Medet ya Şahê Erbilê
Gelek îro gunehkar im
Medet ya şahê Erbilê

Gunehkar im tebat naê
Giranbar im li dinyayê
Nizanim dê çawan çêkim
Medet ya şahê Erbilê⁵⁸

Her du beytên ewil ên helbesta mezkur a Şêx Nûrî jî bi vî rengî ne:

Ey su’ûda van welatan ey şîrînahya civatan
Cami’ê qencê sifatan şeyxê ser kehnî meded

Ey xweyê fedl û xitaban ey hekîmê her cewaban
Ey selaha van xiraban şeyxê ser kehnî meded

(Q. 3/ 1-2)

Şêx Muşerref helbesta xwe ya li jorê li ser şêxê xwe Şêx Mustefa Kemaleddînê Erbilî nivîsiye. Şêx Nûrî jî helbesta xwe li ser bavê xwe Şêx Es’edê Sanî nivîsiye û her du jî wek medhiye ne. Lê ji uslûbê diyar e ku Şêx Nûrî, helbesta Şêx Muşerref wek mînak daniye pêşiya xwe û wî jî xwestiye helbesteke bi vî rengî binivîse.

Ev jî ji Şêx Muşerref du beytên ewil ên helbesteke din a bi navê “Aferîn ey Nazim û Asim” e ku wek medhiye hatiye nivîsîn.

Her du beytên ewil ên helbesta mezkur a Şêx Muşerref.

‘Aferîn ey Nazim û ‘Aşim hezar car ‘aferîn
Her bi keyf û şahiyên bin dûr ji her huzn û girîn

⁵⁸ Sönmez, h.b., r. 242.

Her di hifza zu'l-celal da bin ji kullê afetan
Hûn bibin melhem ji bona qelbê pir derd û birîn⁵⁹

Ev jî ji helbesta Şêx Nûrî du beytên ewil in ku li ser Melayê Bateyî nivîsiye:

Aferîn sed aferîn bo te ey xwace Huseyîn
Sed sena û medhê şîrîn bo te ey xwace Huseyîn

Qewlê te xeyalek belîx in lefzê te xayet şîrîn in
Te bi wan ihya kirin millet û dîn xwace Huseyîn

(Q. 11 / 1-2)

Di vê helbestê de jî diyar e Şêx Nûrî îlhama xwe ji Şêx Muşerref wergirtiye û wî jî bi îfade û uslûbeke gelek nêzîk helbesta xwe nivîsiye.

Wek me di serî de jî diyar kir Şêx Nûrî, ji aliyê edebî û temayan ve gelek di bin tesîra Şêx Muşerref de maye. Ji xeynî mînakên ku me li jorê nîşan dane em dikarin hin nimûneyên din jî nîşan bidin. Lê ji ber ku hemû mînakên tespîtîkirî wê me derxe derveyî mijarê me nexwest hemûyan bidin.

⁵⁹ Sönmez, h.b., r. 157.

BEŞA SÊYEMÎN

JI ALIYÊ RUXSARÎ VE LÊKOLÎNA DÎWANÊ

3.1. Taybetiyên Teşeyê

3.1.1. Şiklê Tertîbê

Nusxeya Dîwana li ber destê me ji 45 waraqaan pêk tê. Dîwan, ewilî bi helbestên kurdî destpê dike pişt re bi helbestên tirkî dewam dike. Piştî helbestên tirkî jî helbestên bi erebî cih digirin. Di dawiyê de jî dîsa helbestên bi kurdî cih digirin. Lê Dîwana Şêx Nûrî ne dîwaneke mureteb e yanî bi hemû herfên elîfbêya erebî helbest nehatine nivîsîn.

3.1.1.1. Rêz, Hejmar û Herfa Qafiyeyê ya Helbestan

Li jêrê me helbestên di Dîwanê de, ji aliyê herfa qafiyeyê, hejmara helbestên ku bi heman qafiyeyê hatine nivîsîn û rêza helbestan ve, tesnîf kirine.

Tablo 1. Rêz, hejmar û herfa qafiyeyê ya hemû helbestên di Dîwanê de

Herfa Qafiyeyê	Hejmara Helbestan	Rêza Qafiyeyê di Dîwanê de
ا – a	5	1, 12, 13, 32, 34
ب – b	2	7, 19
ت – t	1	28
ج – c	1	26
د – d	3	4, 14, 27
ر – r	1	23
ف – f	1	15
ك – k	2	9, 22
ل – l	2	29, 33
م – m	3	16, 17, 18
ن – n	4	10, 24, 35, 38
و – w	1	8
ه – h	4	2, 3, 11, 37
ی – y	4	20, 21, 25, 30
ئ – ê	2	5, 36
ء – ê	1	6
ة – t	1	32

Her wiha me du helbestên din ên Şêx Nûrî tespît kirin ku di nusxeya li ber destê me de nînin. Em ê li xwarê ji aliyê herfa qafiyeyê agahiyên van her du helbestan jî bidin.

Tablo 2. Hejmar û herfa qafiyeyê ya her du helbestên mezkur

Herfa Qafiyeyê	Hejmara Helbestan
û – n	1
ى – y	1

3.1.2. Dîwan an Dîwançe?

Ku em her du helbestên di tabloya duyem de jî li ser Dîwanê bihesibînin û hemzeyê (ء) jî wek herfeke serbixwe nehesibînin, em dibînin ku bi tevahî bi 16 herfan helbest hatine nivîsîn. Bi gotineke din helbestên di Dîwanê de, ne li gorî elîfbêya erebî hatine rêzkirin û bi hemû herfan helbest nehatine nivîsîn. Di vê rewşê de gelo divê mirov vê berhemê wek dîwan bihesibîne yan wek dîwançe. Ji bo cewaba vê pirsê em ê pêşî cih bidin pênaseyên van her du têgehên.

Dîwan:

Ji wan kitêban re ku şîrên helbestvanekî li gorî tertîbekê tê de hatine komkirin dîwan tê gotin. Ji bo dîwanên ku li gorî tertîba dîwanan hatine rêzkirin jî dîwanên mureteb tê gotin.⁶⁰ Mesnewiyên serbixwe ne tê de hemû teşeyên nezmê yê wekî xezel, qesîde, murabbe', muxemmes, texmîs, terkîb bend û hwd. di dîwanê de cih digrin. Lê ji van teşeyan sê cure girîng in. Qesîde, xezel û musemat. Bi awayekî giştî di dîwanan de pêşî qesîde, pişt re xezel piştî wan jî musemet cih digrin. Eger hebin teşeyên biçûk ên wekî "rûbaî" "mufred"an di herî dawî de cih digrin. Ji wan dîwanên ku bi hemû herfên elîfbêya erebî di wan de helbest kom bûne û teşeyên nezmê jî li gorî vê rêzê di wan de cih girtine re, "dîwanên mureteb"(dîwanên tertîpkirî) tê gotin.

Mirov dikare bêje ku di edebiyata kurdî de ji bo dîwanan tiştê esas ew e ku li gorî serwayên helbestan bi awayekî elîfbêyî li pey hev hatibin rêzkirin. Wate rêza teşeyên nezmê û naverokê ne girîng e.⁶¹

⁶⁰ Mustafa Uslu, *Ansiklopedik Türk Dili ve Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Yağmur Yayınları, İstanbul 2007, r. 83.

⁶¹ Doç. Dr. Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiya Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2014, r. 450-451.

Dîwançe:

Dîwanên biçûk in. Hin şair, carnan bi qasî têra dîwanekê helbestên wan nînin. Ji bo wan kitêbên ku ev helbest tê de hatine komkirin dîwançe tê gotin. Taybetmendî û hemû cureyên helbestên ku di dîwaneke mureteb de cih digrin, di van de cih nagrin.⁶² Di dîwançeyan de helbest ne li gorî rêza elîfbêya erebî hatine rêzkirin û wek hecm jî biçûk in.

Li gorî van pêname û taybetmediyên ku me li jorê îzah kirin, mirov dikare berhema Şêx Nûrî ne wek dîwan zêdetir wek dîwançe bihesibîne. Lewra ne dîwaneke mureteb e û bi hemû herfên elîfbêya erebî helbest nehatine rêzkirin û nivîsîn. Lê ji ber ku li ser nusxeya li ber destê me de wek “Dîwana Şêx Muhemmed Nûrî” hatiye nivîsîn, em jî wê wek dîwan qebûl dikin û bi vî navî pêname dikin.

3.1.2.1. Rêz, Hejmar û Herfa Qafiyeyê ya Helbestên bi Kurdî

Tablo 3. Rêz hejmar û herfa qafiyeyê ya helbestên bi kurdî ên di Dîwanê de

Herfa Qafiyeyê	Hejmara Helbestan	Rêza Qafiyeyê di Dîwanê de
ا – a	3	1, 12, 13
ب – b	1	7
د – d	2	4, 14
ف – f	1	15
ك – k	1	9
ن – n	3	10, 35, 38
و – w	1	8
ه – h	4	2, 3, 11, 37
ئ – ê	2	5, 36
ء – ê	1	6

Wek di tabloya 3yan de jî xuya dibe ji helbestên bi kurdî, yek bi hemzeyê(ء) hatiye nivîsîn. Lê ji ber ku ew ne wek herfeke serbixwe ye û di helbestê de dengê ê “ئ”(ê) dide em ê wê jî wek dengê (ئ – ê) bihesibînin. Di vê rewşê de mirov dikare bêje ku Şêx Nûrî helbestên xwe yên bi kurdî, bi tevahî bi 9 herfan nivîsîne ku yek ji wan wek dengê kurdî “ئ”(ê) ye. Wek li jorê jî xuyaye bi 4 helbestan herî zêde bi herfa (ه – h)yê helbest hatine nivîsîn.

⁶² Uslu, h.b., r. 83-84.

3.1.3. Ji Aliyê Nezmê ve Teşeyên Helbestan

Şêx Nûrî, helbestên xwe yên bi kurdî, bi çar teşeyên nezmê nivîsîne ku ev jî qesîde, murebbe', mesnewî û yek malik in. Şeklên nezmê yên di Dîwanê de cih digrin ne nîzamî ne, bi awayekî têkel hatine nivîsîn. Bi teşeya xezelê helbest nehatine nivîsîn ku yek ji cureyên sereke yên edebiyata klasîk e. Ji helbestên wî yên bi kurdî ên di Dîwanê de; 12 heb qasîde, 4 heb murebbe', du yekmalik û yek jî mesnewiyek e.

3.1.3.1. Qesîde

Qesîde peyveke erebî ye. Ji koka "qesede"yê tê û tê maneya niyetkirin, nêzîkbûn, qestkirin û çûyîna ber bi tiştekî ve.⁶³ Weke pênase di wêjeyê de tê wateya ji bo pesîndayîna kesekî /ê û ji bona di nivîsandina helbestan de alîgirtin. Qesîde ji edebiyata ereban hatiye afirandin, di edebiyata îraniyan de xurt bûye û kurdan jî tevli wêjeya xwe kiriye.⁶⁴

Di edebiyata kurdî de bi giştî qesîde ji pêc-heft beytan heta bi derdora bîst sî beytî pêk tê. Di edebiyata kurdî de hinek qesîdeyên ji sî beytî dirêjtir jî tên dîtin.⁶⁵ Qafiyeya wê wisa ye.

1.a a
2.xa
3.xa
4.xa

Ji beyta yekem ya qesîdeyê re "metla" ji ya dawî re "meqta" ji beyta herî xweş re "beytu'l-qasîd"(şah beyît) tê gotin. Ji wan beyt an beytan re ku mexlasa helbestvan tê de derbas dibe jî "tac beyît" tê gotin. Di qesîdeyê de bi piranî li ser pesnê desthilatdarekî siyasî yan jî kesayetekî giregir tê rawestan. Mebesta helbestvan ji nivîsîndina qesîdeyê, bîdestxistina hîmayeya desthilatdar û qezenckirina

⁶³ Yaşar Aydemir, *Türk Edebiyatında Kaside*, Dergipark, h. 22, r. 68.

⁶⁴ Sönmez, h.b., r. 29.

⁶⁵ Adak, h.b., r. 405.

piştgiriyeke malî ye. Lê gelek caran jî qesîde derhekê pesindayîna kesên dînî de jî tîn nivîsandin.⁶⁶

Mijarên ku di qesîdeyan de cih digrin ev in: Tewhîd, munaceat, ne'et pesindayîn, rexne û şîn.⁶⁷

Şêx Nûrî, herî zêde terza qesîdeyê emilandiye. Ji 19 helbestên wî yên bi kurdî, 12 heb bi terza qesîdeyê ne.

Tablo 4. Rêz, hejmara beytan û behr û qalibên qesîdeyên bi kurdî

Rêza qesîdeyê di Dîwanê de	Hejmara beytan	Behr / Qalibê erûzê
1	28	Hezec/ Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun
3	10	Remel/ Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun
4	12	Remel/ Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun
5	40	Remel/ Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun
6	10	Remel/ Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun
7	10	Remel/ Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun
9	14	Hezec / Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun
11	20	Remel / Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun fa'îlun
14	12	Hezec / Mefa'îlun Mefa'îlin Fe'ûlun
15	12	Remel / Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun fa'îlun
35	6	Remel / Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun fa'îlun
38	66	Hezec/ Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

Wek di tabloyê de jî xuya dibe di navbera hejmarên beytên qesîdeyan de jî gelek ferq heye. Qesîdeya herî dirêj ji 66 beytî pêk tê. Bereksê vê qesîdeya herî kurt jî ji 6 beytan pêk tê.

3.1.3.2. Murebbe'

Ji wan menzûmeyên ku her bendeke wê ji çar misrayan pêk tê û bi heman weznê hatine nivîsîn re, murebbe' tê gotin.⁶⁸ Benda ewil di nav xwe de bi qafiye ye. Misraya dawî ya benda ewil, divê di dawiya her bendê de yan bi heman rengî dubare bike yan jî qafiyeya wan wek hev be. Ji aliyê teşeyê ve du cure murebbe' hene. Yek muzdewîc ya din jî mutekerîr. Heke misreyên dawî yên bendan bi tenê ji aliyê qafiyeyê ve wek hev bin ji van murebbe'yan re "murebeb'yên muzdecîc" tê gotin. Lê

⁶⁶ Adak, h.b., r. 406.

⁶⁷ Sönmez, h.b., r. 29.

⁶⁸ İskender Pala, *Divan Edebiyatı*, Kapı Yayınları, İstanbul 2012, r. 81.

heke misraya benda ewil di dawiya hemû bendan de bi heman şiklî tekrar bike ji wê re jî “murebbe’ya mutekerrîr” tê gotin.⁶⁹ Qafiyeyên wan bi vî rengî ne:

Murebbe’ya muzdewîc

aaaa, bbba, ccca

Murebbe’ya mutekerrîr

aaaA, bbbA, cccA

Di edebiyata klasîk da herî zêde murebe’a mutekerrîr hatiye bikaranîn.⁷⁰ Zimanê murebe’yan bi piranî zimanekî sade û xwedan vegotînele tabî’î ye. Murebbe’ jî xeynî işqê derbarê, pesîndayîn, şîret û nesîhet, şermezarkirin û perwerdeyê de ye. Şêx Nûrî piştî qesîdeyan herî zêde bi teşeya murebbe’yê helbest nivîsîne.

Tablo 5. Rêz, hejmara beytan û behr û qalibên murebbe’yên bi kurdî

Rêza murebbe’yê di Dîwanê de	Hejmara beytan	Behr / Qalibê erûzê
8	7	Recez/ Mustef’ilun Mustef’ilun
12	15	Recez/ Mustef’ilun Mustef’ilun
13	4	Recez/ Mustef’ilun Mustef’ilun
36	18	Recez/ Mustef’ilun Mustef’ilun

Şêx Nûrî her çar murebbe’yên xwe jî di şiklê “murebbe’ya mutekerrîr” de nivîsîne.

Kanî çiraê milletan

Kanî tebîbê ‘illetan

Şehraê piştî min qetan

Babê yetîman ka gelo

Ka xewsê pur ‘alî meqam

Ka murşidê şîrîn-kelam

Kanî gelo meqsûdê ‘am

Babê feqîran ka gelo

(M. 1/ 1-2)

⁶⁹ Prof. Dr. Cemal Kurnaz û Dr. Halil Çeltik, *Divan Şiiri Şekil Bilgisi*, H Yayınları, İstanbul 2011, r. 158-159.

⁷⁰ Bnr., Sönmez, h.b., r. 32.

3.1.3.3. Yekmalik

Yek malik di ferhengê da tê wateya yek û bi tenê, di edebiyatê da weke pênasê tê wateya helbesta yekmalika ku pêşiya wê û dawiya wê tune ye, yanê bi serê xwe hatiye nivîsandin û têkiliya wê bi malikên din ra tune ye, tê gotin. Di nezma yekmalikê de lihevhatina qafiyeyê ne şert e.⁷¹

Şêx Nûrî bi terza yekmalikê du helbest nivîsîne û her malikek di nav xwe de bi qafîye ye.

Tablo 6. Rêz, hejmara beytan û behr û qalibên yekmalikên bi kurdî

Rêza yekmalikê di Dîwanê de	Hejmara beytan	Behr / Qalibê erûzê
2	1	Hezec / Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun
10	1	Remel / Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlun

3.1.3.4. Mesnewî

Mesnewî bes ne di edebiyata kurdî de, di edebiyata klasîk a Rojhilat de, yek ji teşeyên herî berbelav e ku ji beytan pêk tê. Ji peyva erebî ya “Îsnan”ê pêk tê ku tê maneya dudo dudo.⁷² Wekî têgeheke edebî, mesnewî ew teşeya nezmê ya ku hemû beytên wê bi heman qalibê tîr nivîsandin û her beyteke wê di nav xwe de hemsêrwa ye. Ji ber ku di mesnewîyan de du misrayên her beytekê di nav xwe de hemsêrwa ne, ji vî cureyê re mesnewî tê gotin.⁷³ Hejmara beytên mesnewîyan heta bi hezaran jî dibin lê hin caran di dîwanan de mesnewîyên kurt jî peyda dibin. Şiklê qafiyeya wê jî bi vî rengî ye: aa, bb, cc, dd,...

Di nav helbestên bi kurdî yê Şêx Nûrî de bes yek bi terzê mesnewîyê hatiye nivîsîn.

⁷¹ Sönmez, h.b., r. 33.

⁷² Kurnaz û Çeltik, h.b., r. 457.

⁷³ Adak, h.b., r. 417.

Tablo 7. Rêz, hejmara beytan û behr û qalibê mesnewiya bi kurdî

Rêza mesnewiyê di Dîwanê de	Hejmara beytan	Behr / Qalibê erûzê
37	9	Hezec / Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

3.1.4. Wezn

Kêş (wezn) ew pîvan e ku di nezmê de tê bikaranîn. Lê şert e ku nezm bi kîjan pîvanê destpê kiribe bi wê jî biqede. Di edebiyata kurdî da kêşa xwemalî (kîteyî/birgeyî), kêşa erûzê û kêşa azad hatiye bikaranîn. Kêşa xwemalî li ser lihevkirina hejmara kiteyan ava dibe û zêdetir di edebiyata gelêrî da, kêşa erûzê di edebiyata klasîk da û kêşa azad jî di edebiyata modern da hatiye bikaranîn.

Kêşa erûzê di çarçoveya edebiyata klasîk da ji rêbaza ku yeksanbûna rêzên kîteyên kurt û dirêj yan jî girtî û vekirî ra tê gotin.⁷⁴

Kêşa erûzê bi sedan salan wek miletên din yê cîran ji aliyê helbestvanên kurd ve jî hatiye emilandin. Şêx Nûrî jî wek nûnerekî edebiya klasîk helbestên xwe bi kêşa erûzê nivîsîne. Lê ji bo erûzê gelek caran serî li îmale, zîhaf û weslê dide ku ji aliyê rexnegirên edebiyatê ve wek mezûr tên hesabandin.

Tablo 8. Tabloya ku qalib û behrên erûzê yê ku di helbestên kurdî ên di Dîwanê de hatine emilandin.

BEHR	QALIB	HEJMARA BIKARANÎNÊ	
		Hejmara Helbestan	Yekûna Behran
Remel	Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlatun	3	9
	Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlun	6	
Recez	Mustef'îlun / Mustef'îlun	4	4
Hezec	Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun	2	6
	Mefa'îlun / Mefa'îlun / Fe'ûlun	4	

3.1.4.1. Îmale

Eger heceyeke kurt ya beytekê, bi mebesta ku li weznê bê, dirêj bê xwendin, wê demê îmale pêk tê. Bi gotineke dî îmale, dirêjxwendina hêceyeke kurt e. Hebûna

⁷⁴ Sönmez, h.b., r. 33.

îmaleyê ji helbestvan yan nazîmî re wekî qisûr tê qebûlkin. Lê ev qisûr ne di dereceya zîhafê de ye.⁷⁵ Şêx Nûrî jî di helbestên xwe de gelek caran serî li îmaleyê daye.

Kêr giha hestî ilahî zû birêjê rehmetê

Sebr û taqet qet nema ya reb hilîng zeh metê

(Q. 4 / 1)

Tê dikir derman di gavê, derdê bê derman bûya

Rehm û ihsan ya Xuda bû lê tu bû bêşik sebeb

(Q. 6 / 7)

Ey melcea van bê kesan

Umîdê van pist û sistan

'Umir xilas pê nehesan

Ey dergehê rehma xuda

(M. 2 / 12)

Her çî Xuda l'hêvî nehat

Ew naketin zewqa civat

J'destan diçî rûh û heyat

Rabe huzûra ta'etê

(M. 4 / 17)

Bi Şêx Salîhê Sîbkî xewsê kamil

Tebîbê derd û janan melhema dil

(MS. 1 / 1)

Ey du çehvê min birêjê hêstirê xûnê dewam(10)

Ku xezînê 'ilm û 'irfan bûne sandûqê peran

(Q.13 / 4)

3.1.4.2. Zîhaf

Zîhaf tê maneya dûrxistina ji eslê xwe. Lê di erûzê de tê maneya kurtxwendina heceyeke dirêj. Bi gotineke din heke heceyeke girtî wek heceyeke vekirî bê hesabandin wê demê zîhaf pêk tê.⁷⁶

⁷⁵ Adak. h.b., r. 382.

Te fikir derman di gavê derdê bê derman bûya
Rehm û ihsan ya Xuda bû lê tu bû bêşik sebeb

(Q. 6 / 7)

Bulbulê baxê wisalê nazirê dîdarê yar
Ew ji wî dernakevî zewq û şuhûd û hezret e

(Q. 8 / 9)

Heyfa vî ‘umrî ezîz çawan dibûrit bê xebat
Heyfa zarê ‘aliman dibne hevalê qeşmeran

(Q.13 / 1)

Bûye furset neborînin eman xitman neşemrînin
Tu car wîrdan neterkînin biken agir di qelbê da

(Q. 1 / 22)

Babê Hifzulleh ‘eceb derman diket qelb û dilan
Dîtina wî xweş diket fil-hal hezar derd û kulan

(YM. 2 / 1)

Huzûr ser ta‘etan dermanê qelban
We mehrûmî dibit behra betalan

(Q. 14 / 20)

Muhemmed xeyrê xelqan e Muhemmed
Muhemmed yarê subhan e Muhemmed

(Q. 9 / 1)

3.1.4.3. Wesl

Wateya bêjeyî ya weslê bihevvekirin e. Heke peyvek ku dawiya wê bi herfeke dengdar re qediyabe, ji bo lazimiya weznê bi peyveke ku bi tîpeke dengdêr re despê dike, bê girêdan û bi vî rengî bê xwendin, ji vê yekê re wesl tê gotin. Wesl wek qisûreke erûzê nayê hesabandin.⁷⁷

Welakîn nîne ew zalim we haşa

We belkî muhsin e der her du halan

(Q. 14 / 5)

⁷⁶ Prof. Dr. M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*, 3F Yayınevi, İstanbul 2007, r. 215.

⁷⁷ Saraç, h.b., r. 208.

Nema zehmet temam bû rehmeta xaliq bizan îro
Cemî‘ê xelqê ‘alem rûxweş in îro ser û pê da

(Q. 1 / 5)

Em diçin-tên bê tebat in digirîn guhdar tunîne
Wek ney û nayê dibêjîn subh û êvar nalenal e

(Q. 2 / 3)

Babê Şifa xweş ‘alim e
Ser textê dil xweş hakim e
Lutfek ‘emîm û rahim e
Sed maşilleh Babê Şifa

(M. 3 / 3)

Ey muradê dil keîban Meqseda cumle hebîban
Pişte k û ‘ewna xerîban Şeyxê ser kehnî meded

(Q. 3 / 8)

Cism û canê da bela hingî diçî dijwar dibî
Rahet û sihhet ji min yek car xilas kir vê webaê (4)

(Q. 5 / 3)

Razan beş e ey bê edeb
Maye li ser hêvya te reb
Xewa te bo çî ey ‘eceb
Rabe huzûra ta’etê

(M. 4 / 16)

3.1.5. Qafiye(Serwa) û Cureyên Wê

Weki têgeheke edebî serwa/qafiye, ew aheng e ku di dawiya beytê yan jî di wî cihê ku wekî dawiya beytê tê qebûlkirin de, ji dubarekirina dengên di navbera peyvên cihêwate de derdikeve meydana. Di helbesta klasîk de ji wan herfên ku tên dubarekirin re herfên “rewî”yê tê gotin. Hevbeşiya serwayê di binemeya bêjeyan de pêk bê.⁷⁸ Em ê li xwarê cureyên serwayan ku Şêx Nûrî, di helbestên xwe yên bi kurdî de, emilandine bi mînakên diyar bikin.

⁷⁸ Adak, h.b., r. 395.

3.1.5.1. Li Gorî Cihê Wê di Risteyê de

3.1.5.1.1. Serwaya Bêpaşserwa

Ew serwa ye ku di dawiya risteyan de cih digre.⁷⁹ Bi gotineke din di beytên ku ev serwa tê de heye redîf nîne.

Ey sebata bê dilan wey piştêka her bêkesan
Aşiqê nûra Muhammed Es‘edê mehbûbê **Reb**

Te li me wêrane kir mulk û welat tarî dikir
Te li me ferz kir di gavê xurbeta Şam û **Heleb**

(Q. 6 / 8-9)

Kanî gelo ew xweş-şerab
Ka ew cemala mahitab
Îro heyat lew bû ‘ezab
Babê feqîran ka gelo

(M. 1 / 6)

3.1.5.1.2. Serwaya Bipaşserwa

Di van cureyên serwayan de di dawiya misrayan de paşserwa û berî wê jî serwa cih digre. Ji ber wê jî cihê serwayê carinan nivê misrayê, carinan jî serê misrayê ye⁸⁰

Bi Şêx Es‘ed ku ew behrek tejî bû
Ji xeyrî rebbê ‘alem ew berî bû

(MS. 1 / 1)

Muhammed xeyrê xelqan e Muhammed
Muhammed yarê subhan e Muhammed

(Q. 9 / 1)

⁷⁹ Bamed Serdar, *Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî -Metn û Vekolîn-*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2015, r. 83.

⁸⁰ Adak, h.b., r. 396.

3.1.5.1.3. Serwaya Navekî

Serwaya ku di nava risteyan de cih digre.⁸¹ Di qesîdeyên musemmat ên Şêx Nûrî de hatiye bikaranîn:

Ey su'ûda van wel**atan** ey şîrînahya civatan
Cami'ê qencê sif**atan** şeyxê ser kehnî meded

(Q. 3 / 1)

Ey xweyê camê şer**aban** ey xweyê 'îşq û kitaban
Ey xweyê dost û se**haban** şeyxê ser kehnî meded

(Q. 3 / 11)

3.1.5.2. Li Gorî Hevbeşîya Dengan Cureyên Serwayê

Di çarçoveya hevbeşîya dengan de, di helbestên kurdî yên Şêx Nûrî de, çar cure serwa hatine bikaranîn. Ew jî murdef, mucered, muqeyyed û muesses in. Bi qasî ku me tespît kir ji her çar cureyan herî zêde ya murdef hatiye emilandiye. Ya muqeyyed jî bes carekê hatiye bikaranîn. Li xwarê em ê ji her beşê nimûneyan bidin.

3.1.5.2.1. Serwaya Mucered

Serwaya(qafiye) ku bi tenê bi dubarekirina herfa rewiye pêk tê serwaya mucered e. Di vê cureya serwayê de herfa rewiye bê hereke ye û berî wê herfeke bi hereke heye. Wekî; ...kef / ... sedef", ...ser / ... seher" û hwd.⁸²

Te fikir derman di gavê, derdê bê derman bûya
Rehm û ihsan ya Xuda bû, lê tu bû bêşik se**beb**

(Q. 6 / 7)

Bi şêxê me ku 'Ebdullehê kam**il**
Ji xeyrî ta'etan xalî bibû **dil**

(MS. 1 / 7)

⁸¹ Serdar, h.b., r. 83.

⁸² Adak. h.b., r. 397.

Razan bes e ey bê edeb
Maye li ser hêvya te reb
Xewa te bo çi ey ‘eceb
Rabe huzûra ta’etê

(M. 4 / 16)

3.1.5.2.2. Serwaya Murdef

Serwaya murdef, ew serwa ye ku di xwe de herfa “ridf”ê dihewîne. Herfên ridfê jî “Elîf, Waw û Ye” ne. Eger yek ji van herfan bêyî ku herekeyek stendibe, beriya herfa rewiye di serwayê de bê dubarekirin, ev dibe serwaya murdef. Wekî; “...bihar/ ... şîkar” û hewd⁸³

Bi Şêx Xalid ku ew şeyxê Cezîr e
Ku winda bû di behra fikr û hîre

(MS. 1 / 1)

We fikra qenc ji wê bêhna gulan tê
Diket mesrûr tamam qewm û hevalan

(Q. 14 / 55)

Nûrî diket zarî hewar
Qet’a nema sebr û qîrar
Eslah biken vê nefse har
Ey dergehê rehma Xuda

(M. 2 / 13)

3.1.5.2.3. Serwaya Muqeyed

Serwaya muqeyed, beriya herfa rewiye dubarekirina herfên hemcins ên ku bê hereke ne. Wekî; “...derd / ... merd”, “...xedeng / ...reng û hwd.⁸⁴

Bi qasî ku me tespît kir Şêx Nûrî di helbestên xwe yên bi kurdî de ev cure qafiye bes carekê emilandiye.

⁸³ Adak. h.b., r. 397.

⁸⁴ Adak. h.b., r. 398.

Şêx Xalid ku Zêbar jî bi **zeyn** bû
Bi wê stêra subê ku Şêx Huseyn bû

(MS. 1 / 6)

3.1.5.2.4. Serwaya Muesses

Eger berî rewiye herfeke bi hereke û berî wê jî “elîf”ek hebe “serwaya muesses” tê meydanê. Di serwayên bi vî rengî de ji bo ku aheng pêk bê bi piranî di hemû misrayan de herfa “Elîf/A “yê tê dubarekirin.⁸⁵ Tevî ku di edebiyata kurdî de serwayên bi vî rengî kêmbin jî Şêx Nûrî bi vê serwayê jî helbest nivîsine.

Sed hezar car xêr **silamet** ey bira hacî Şerîf
Sed hezar ‘izz û **emanet** ey bira hacî Şerîf

(Q. 10 / 1)

3.1.6. Redîf (Paşserwa)

Di dawiya misrayan de wekhevîya nivîsandin û maneya heman deng e.⁸⁶ Li gor tiştên ku tên dubarekirin sê cure paşserwa hene. Li xwarê em ê ji Dîwanê mînakên van cureyan bidin.

3.1.6.1. Redîfên ku di Halê Qertafan de ne

Di vê cureya paşserwayê de tiştên ku tên dubarekirin ji qertafan tenê pêk tên.⁸⁷

Quwwet û taqet bu wî bû, sihheta min her bu wî
Keyf û şahî min bu wî, wî me‘dena lutf û sexaê

(Q. 4 / 1)

Kanî çiraê **milletan**
Kanî tebîbê ‘**illetan**
Şehraê pişta min qe**tan**
Babê yetîman ka gelo

(M. 1 / 1)

⁸⁵ Adak. h.b., r. 398.

⁸⁶ Pala, h.b., r. 29.

⁸⁷ Adak. h.b., r. 399.

3.1.6.2. Redîfên ku di Halê Qertaf û Bêje an Kombêjeyan de ne

Di vê cureya paşserwayê de tiştên ku tên dubarekirin ji qertaf û bêje yan jî kombêjeyan pêk tên.⁸⁸

Muhammed şafi'ê meh şer Muhammed

Muhammed rehm û îhsan e **Muhammed**

(Q. 9 / 9)

Bêje û bibhê birader ev çî weqt û **ev çî hal e**

Ev çî qîl e tu beyan ke bêje min tu **ev çî hal e**

(Q. 2 / 2)

3.1.6.3. Redîfên ku di Halê Bêje an jî Kombêjeyan de ne

Di vê cureya paşserwayê de qertaf tine ye. Piştî serwayê bêje yan kombêje tên dubarekirin⁸⁹

Sed hezar car xêr silamet **ey bira hacî Şerîf**

Sed hezar 'izz û emanet **ey bira hacî Şerîf**

(Q. 10 / 1)

Ya Reb he ro sed car **şukur**

Ya Reb he ro sed bar **şukur**

Ya Reb he ro bê hed **şukur**

Ey dergehê rehma Xuda

(M. 2 / 14)

⁸⁸ Adak. h.b., r. 399.

⁸⁹ Adak. h.b., r. 400.

BEŞA ÇAREM

CUREYÊN NEZMÊ Û TEMAYÊN DI DÎWANÊ DE

Helbest û menzûmeyên edebiyata klasîk bes ne li gorî teşeyê xwe her wiha li gorî mijar û naveroka xwe jî li ser cureyan tînesnîfkirin. Bi riya cure û naveroka helbestan mirov; fikr, raman, bawerî, zewq, hizra dînî, tesewufî û civakî û hwd. ya şair fêhmî dîke û dikare li ser wî qeneatek peyda bibe.

Mirov dikare bêje di helbestên bi kurdî ên Şêx Nûrî de, çend cure û mijarên sereke derdikevin pêş. Di esasê xwe de ji aliyê naverokê ve mirov dikare helbestên wî yê bi kurdî, li ser du beşan dabeş bike. Helbestên dînî-dîdaktîk (pend û exlaq) û yê din. Bi taybet mirov dikare helbesta wî ya bi navê “Şeceretu Nesaih” di vê kategoriyê binirxîne ku ji destpêkê û du fêslê û binbeşên wan pêk tê. Lazim e em li vir li ser xalekê rawestin. Gelo divê em helbestên wî yê bi vî rengî, wek “helbest” qebûl bikin yan wek “menzûmeyên dînî-dîdaktîk” Ji bo bersiva vê pirsê jî em ê pêşî ferqa nezm û helbestê diyar bikin.

Ji aliyê rûxsarî ve nezm jî helbest jî wek hev in. Lê heçî nezm e di naveroka wê de zehftir mijarên pedagojîkî, dîdaktîkî û zanistî hene. Zimanê wê sade ye, hunerên edebî tê de zehf cih nagrin. Lê heçî helbest e, di naveroka wê de zehftir mijarên lîrîk û evînî hene. Zimanê wê giran e û helbestvan bi zehfî cih dide hunerên edebî. Li gorî vê îzahê hemû helbest nezm in; lê hemû nezm ne helbest in.⁹⁰

Li gorî vê îzahatê di esasê xwe de divê em helbestên Şêx Nûrî ên dîdî-dîdaktîk û bi taybet helbesta bi navê “Şeceretu Nesaih” ku bi naveroka xwe ji şîretan pêk tê, ne wek helbest wek menzûmeyên dînî dîdaktîk qebûl bikin. Lê ji ber ku ev “helbest” ne wek berhemeke serbixwe hatine nivîsîn û wek şîr di nava Dîwanê de hatine bicihkirin, em ê jî wan wek helbest qebûl dikin.

4.1. Mersiye

Ji bo wan helbestên ku ji ber xemgîniya ji ber wefata kesekî hatine nivîsandin re mersiye tê gotin. Bi wateya xwe ya ferhengê mersiye tê wê maneyê ku mirov

⁹⁰ Adak, h.b., r. 402.

behsa qencyên kesekî mirî bike, xemgîn bibe û bigrî.⁹¹ Mersiye çawa ku li ser sultanekî yan şêxekî bêne nivîsandin her weha li ser kesayetekî ji malbatê jî tên nivîsandin. Mersiye ji aliyê rûxsarî ve zehftir bi terzê qasîdeyê hatiye nivîsandin.⁹²

Şêx Nûrî jî di helbestên xwe de cihekî girîng û taybet daye mersiyeyan. Ji 19 helbestên wî yên bi kurdî, 5 heb mersiye ne. 4 ji wan bi terzê qasîdeyê hatine nivîsîn yek jî bi terzê murebbe'yê. Her çi qas wek hejmar kêma xuya bike jî bi yekûna xwe ya beyt û bendan piştî medhiyeyan herî zêde mersiyeyên wî cih digrin. Mirov dikare bêje ku di sedsala bîstan de di warê edebiyata kurdî de piştî Mele Zahirê Tendûrekî yek ji kesên herî girîng e ku bi cureya mersiyeyê, helbest nivîsîne.

Ji 5 mersiyeyên xwe 4 heb li ser wefata bavê xwe Şêx Es'edê Sanî(k.d. 1967) nivîsîne. Dema mirov li mersiyen wî dinêre ku bavê wî Şêx Esed Sanî bi tenê ne wek bavek her wiha wek rêber û destek jî di jiyana Şêx Nûrî de, cihekî taybet girtiye. Ji ber vê hindê wefata bavê wî wek rûhî û qelbî tesîreke mezin lê kiriye û bi rengekî bûye wesîle ku van mersiyeyan binivîse.

Kêr giha hestî ilahî zû birêje rehmetê
Sebr û taqet qet nema ya reb hilîne zehmetê

Tam di vê zistanê yek car burqê êş û eleman
L'me veda yek car hucûm kir ordiya her 'illetê

Çar kinaran 'eskerê sermaê çêkir wan çeper
J'me birîn wan eva sebr qût û zadê taqetê

Quwwet û taqet nema yek car me winda kir su'ûd
Çare û hêvî nema winda bû nûra hikmetê

Qet nema êdî bizanîn derdekî dermanekî
Qet nema êdî binasîn melhemê yan şerbetê

⁹¹ Dr. Mehmet Arslan û Mehtap Erdoğan, *Kerbela Mersiyeleri*, Grafiker Yayınları Ankara 2009, r. 53.

⁹² Abdurrahman Adak, *Têbîneyên Dersên Paleografya û Zanista Helbesta Kurdî*, Notên Dersan, Mêrdîn 2012, r. 80.

Wan li me ûcax tefandin top û tîr pur rêhtine
Em yetîm û bê mecal maîn di çola zilletê

Min hebû babek bu wî ez daîma rahet dibûm
Vê şubatê wî wefat kir ah ji destê firqetê

(Q. 4 / 1-2-3-4-5-6-7)

Quwwet û taqet bu wî bû, sihheta min her bu wî
Keyf û şahî min bu wî, wî me' dena lutf û sexaê

Vê şubatê ez dirêjim hêstiran lew bi şewat
Wî sefer kir axretê ez paş ve dam hekmê qezaê

(Q. 5 / 7 -8)

Lê sekna Şêx Nûrî ya li ber mirinê ne wek reşbîniyek e, di çarçoveya îman û
bîr û baweriya îslamê de wek teslîmbûn û xweşbûna ji hikmê Xwedê ye.

Ya îlahî ez şukurdar im bi hukmê te xweş im
Tu ji Şeyxê me gelek razî bibe be cennetê

Heqqê wî heqek mezin ber me ve ya Reb tu bide
Merteba wî pur mezin ke der meqamê hezretê

Tu j' me jî razî bibe xeyra me jî mazin bike
Bi xatirê Ehmed Muhammed şehsuwarê ummetê

(Q. 4 / 32-33 -34)

Wek taybetmediyeke mersiyeyan ku şair li ser kê mersiye binivîsîn behsa
qencî û fezîletê wî dikin, Şêx Nûrî jî di mersiyeyê xwe ev reng diyar kiriye.

Ka xewsê pur 'alî meqam
Ka murşidê şîrîn-kelam
Kanî gelo meqşûdê 'am
Babê feqîran ka gelo

Kanî şeraba muhbetê
Kanî rihana cennetê
Kanî îmamê ta'etê
Babê feqîran ka gelo

(M. 1 / 1-2)

Şêx Nûrî mersiyeyek jî li ser Hacî Şerîf nivîsiye ku Şêx Muşerref jî ji bo heman kesî nameyeke menzûm nivîsiye. Di vê mersiyeyê de jî xuya dibe ku têkiliyeke xurt ya Hacî Şerîf û Şêx Nûrî hebûye.

Tu çuwî kul bûn gelek hêstir ji çav hatin gelek
Care dî dax kir felek dil ey bira Hacî Şerîf

Kanî ew keyf û fereh çûn û xilas bûn bûne xem
Ew civata şekkerî ka ey bira Hacî Şerîf

Kanî ew zewq û tereb ah kanî ew lezzet 'eceb
Care dî jan da kezeb ah bira Hacî Şerîf

Kanî ew zikr û sulûk ah kanî ew xesxîr Xinûk
Ew şekir şêrîn-xulûk ka ey bira Hacî Şerîf

(Q. 10 / 2-3-4-5)

4.2. Medhiye

Medhiye ji bo wan helbest û nivîsan tê gotin ku derbarê pesindayîna kesekî de te tên nivîsîn. Medhiye yan li ser şêx û alimekî îslamê yan jî li ser sultan, wezîr û mezinekî di heyema şair de tên nivîsîn. Piranî bi terzê qesîdeyê tene nivîsîn ku bi giştî armanca nivîsandina qesîdeyan jî ji xwe pesindayîna kesekî yan tişteki ye. Ji xwe navê beşeke qesîdeyê jî medhiye ye. Şair medhiyeya xwe li ser kê nivîsîbe, behsa qehremanî, cesaret, qencî camêrî û faziletên wî/wê dike.⁹³

Wek edebiyata erebî û farisî ev cure jî di edebiyata kurdî de gelek hatiye emilandin. Şêx Nûrî jî bi vê cureyê heşt helbestên bi kurdî nivîsîne û bi hejmara bend û beytên xwe ji hemû cureyên din ên bi kurdî zêdetir e.

⁹³ Bnr., Pala, h.b., r. 110-111.

Wek mersiyeyên wî piraniya medhiyeyên wî jî li ser bavê wî û şêxê wî Şêx Es'edê Sanî ne. Ji mersiyeyên wî pênc heb li ser bavê wî ne. Yek li ser birayê wî û Şêxê wî Şêx Muşerref yek li ser birayê wî yên din Şêx Munewwer û yek jî li ser şêxên terîqeta wî ye. Her wiha bi terzê xwe jî çar ji wan bi şiklê qesîdeyê, du bi şiklê murebbe'yê, yek jî bi şiklê mesnewiyê û yek jî bi şiklê yekmalikê hatine nivîsîn.

Babê Hifzulleh 'eceb derman diket qelb û dilan

Dîtina wî xweş diket fil-hal hezar derd û kulan

(YM. 2 / 1)

Ew e her murşidê zana ew e her 'arifê rênas

Binasî ger divê ew Şêx Munewwer bû di hucre da

(Q. 1 / 13)

Ey tebîbê her birînan rehnîya çehvê evînan

Şahiya qelbê hezînan şeyxê ser kehnî meded

(Q. 3 / 4)

Çi xweş kenz e çîqa xweş kîmiya ye

Dilan zengîn diket Şeyxê Xinûkê

(Q. 7 / 3)

Bi Şêx Es'ed ku xewsê vî zemanî

Helîm û behrekê 'ilm û me'anî

(MS. 1 / 8)

Wek li jorê jî hat diyarkirin, Şêx Nûrî piraniya medhiyeyên xwe li ser bavê xwe nivîsîne.

Ey pişteka van 'asiyan

Ey murşidê Berwariyan

Derman bike van naliyan

Ey dergehê rehma Xuda

(Q. 2 / 4)

Nedîtin wek wî min zana û 'arif

Ji hemyan ferq diket Şeyxê Xinûkê

Me navêtin ji xeyrî te kesek dî
Ku muşkil hel biket Şeyxê Xinûkê

(Q. 7 / 9-10)

Rehniya vê 'alemê babê Muşerref murşid e
Bo cemî'ê dost û ehbaban xusûsî rehmet

(Q. 8 / 3)

Şêx Nûrî di jiyana xwe ya şehsî, ilmî û edebî de gelek di bin tesîra Şêx Muşerref de maye ku him îcazeta xwe ya ilmî him jî ya terîqetê ji wî wergirtibû. Em vê tesîrê di mersiyyeyên li ser wî de jî dibînin.

Babê Şifa xweş 'alim e
Ser textê dil xweş hakim e
Lutfek 'emîm û rahim e
Sed maşilleh Babê Şifa

Babê Şifa nûra Xuda
Her çî ku girt û berneda
Ew dê bigehte meqseda
Qesem dikem Babê Şifa

(M. 3 / 3-4)

4.3. Ne't

Ne'et ji wan helbestan re tê gotin ku li ser pesindayîna Hz. Mihemed hatine nivîsîn. Nivîskar bi vî rengî daxwaza şefeate dîke. Bi giştî bi terza qesîdeyê tene nivîsîn. Şêx Nûrî jî bi vê cureyê helbest nivîsiye.

Muhemmed xeyrê xelqan e Muhemmed
Muhemmed yarê subhan e Muhemmed

Muhemmed qasidê rehman Muhemmed
Muhemmed canê canan e Muhemmed

Muhemmed 'illeta darû Muhemmed
Muhemmed derd û derman e Muhemmed

Muhammed şemsê taban e Muhammed
Muhammed nûrê nûran e Muhammed

(Q. 9 / 1-2-3-4)

4.4. Tewhîd

Ji wan helbestên ku derheqê yekîti û mezînatîya Xwedê de hatine nivîsan re tewhîd tê gotin. Bi piranî di dîwanan de cih digrin û bi terzê qesîdeyê tene nivîsandin. Di tewhîdan de bi piranî li ser yekîtiya Xwedê, nezeriyaya wahdetu'l wucudê û sîfetên Xwedê tê rawestandî. ⁹⁴

Di seranserê helbestên Şêx Nûrî de ev mijar xwe diyar dîke.

Îlahî hemd û minnet bo te bin her
Tu wî feyyazê her new 'ê kemalan

(Q. 14 / 1)

Çikû esbab ewî her kirne hazir
Beyan kirye ji bo xwuyî 'eql û halan

(Q. 14 / 14)

Îlahî ya îlahî ya îlahî
Îlahî ya îlahî zulcelalan

Ji lutfê te diken daxaz û zarî
Tu her me çêbikey der kullî halan

(Q. 14 / 61-62)

4.5. Hicviye

Ji bo helbestên ku mijara wan rexne û devavêtin be hicviye tê gotin. Bereksê medhiyeyê ye. Di wan de şexsek an saziyek yan jî civak û mijarek tê rexnekirin. ⁹⁵ Bi terzê xezel, qesîde, murabbe' û muhammesan tene nivîsîn.

⁹⁴ Adak, h.b., r. 79.

⁹⁵ Pala. h.b., r. 115.

Ey xafilê xew lê şîrîn
Mirî di nav doşek nivîn
Qesrê bihuştê zeyyinîn
Rabe huzûra ta'etê

Li cenetan vebûn derî
Rabe werî ey serserî
Ehmeq nebe mişlê kerî
Rabe huzûra ta'etê

(M. 4 / 1-2)

Ji mehbûb dûr kirim îro felek zalim ji min bes ke
Te mêlaka mi ker ker kir ji min bes ke ji min bes ke

(YM. 1 / 1)

Ey du çehvê min birêje hêstirê xûnê dewam
Ku xezînê 'ilm û 'irfan bûne sandûqê peran

(Q. 13 / 4)

Şêx Nûrî di rexneyên xwe de caran îfadeyên giran jî bi kar tîne.

Heyfa vî 'umrî ezîz çawan dibûrit bê xebat
Heyfa zarê 'aliman dibne hevalê qeşmeran

Heyfa malê xanedan dibne cihê le'b û lehû
Heyfa şexsê xwey-esalat bibne teşbîhê keran

(Q. 13 / 1-2)

Ev wezîfê pur mezin ketne di dest bê edeban
Ev meqamatê muqeddes ketne destê xer-meran

(Q. 13 / 5)

4.6. Pend û Exlaq

Ev cure berhem bi piranî ji bo zarokan hatine nivîsîn û mijara wan nesîheta li wan e. Di vî warî de Nehcu'l-Enama Mele Xelîlê Sêrtê berhemeke girîng e. Lewra di

vê berhemê de li ser du mijaran hatiye rawestin. Ya yekem Eqîde, ya duyem jî exlaq e. Di beşa exlaqê de Mela Xelîl nesîhetên exleqî li zarokan kiriyê.⁹⁶

Şêx Nûrî jî ku li gelek cih û waran medrese ava kirine û bi sedan feqî perwerde kirine, di çarçoveya pend û exlaqê de, cihekî berfireh daye vê mijar û temayê. Wek me li jorî jî diyar kir helbesta wî ya bi navê “Şeceretu Nesaih”(Secereya Nasîhatan) rast e rast li ser vê mijarê ye ku ji 66 beytan pêk tê. Mirov ji îfade û naveroka wê fêhm dika ku bi taybet ji bo zarok û feqiyan hatiye nivîsîn.

Ev helbest ku me berê jî gotibû mirov dikare wê wek menzûmeyerê serbixê jî qebûl bike, ji muqeddîme, du fêsl û xatîmeyerê pêk tê.

El muqeddîme

Ji bona we çî got min hûn hifiz ken
Çikû ew çêtir e bo we ji malan

Ji bo we darekê ez dê bişînim
Ji bo we her bidet fêkî kemalan

(Q. 14 /4-5)

Fesla ewil li ser teqwayê ye ku ji 12 beytan pêk tê û helbestvan şîretan li zarok û feqiyan dika.

Feslut- Teqwayê

Serê her ‘ilmekî teqwa Xuda ye
Çikû xaliq ew e feyazê halan

Ew e xaliq ji bona her menafi‘
Ji bo derran keza ey pur kemalan

Kesê rabû bi lutfê wî xuya ye
Eger ne, dê bibit kêmi hevalan

⁹⁶ Adak, h.b., r. 119.

Kesê ket ew bi qehra wî xwe zelîl e
Eger ne, dê bibit muxtarê malan

(Q. 14 / 1-2-3-4)

Bereksê “Fesla Teqwayê” “Fesla Edebê” li ser çar beşên wek; “Edeba Seyda, Edeba Ilmê, Edeba Hevalan û Edeba Hucran” hatiye dabeşkirin. Bi vî rengî diyar dibe helbestvan zêdetir girîngî daye vê mijarê.

Fesla Edebê

Ji bo ‘ilmê edeb pur şert û ferz e
Edeb nêzîktir e j’ maman û xalan

Xweyê wî daîma her padişah e
Kesê bê wî rezîlê hal û malan

(Q. 14 /21-22)

Edeba Seyda

Dema mêhvan hebin hazir nebin hûn
Eger hatin bibin teşbîhê lalan

Ji bona xizmetan hazir we hiş bin
Li nik wî qet nebin xerqê mitalan

(Q. 14 / 31-32)

Edeba ilmê

Biken tehsîl di ‘ilmê mişlê şêran
Biken teşwîq li tehsîlê hevalan

Nebîtin hûn bi ‘ilmê xwe kubar ken
Bibin bê qedrê ‘amî wek şekalan

(Q. 14/ 33-34)

Edeba hevalan

Qusûrê hev nenêrin hûn tu caran
Neken şerha nebaş lefza hevalan

Seba hev qet neken ew pur xirab e
Tu car ifşa neken ‘eyba hevalan

(Q. 14/ 44-45)

Edeba hucran

Temîz bigrin dewamê her du hucran
Neken rûreş tu car seb qirş û qalan

Ji bona xizmeta wan mislê şêr bin
Xwe sist û pist neken misslê betalan

(Q. 14/46-47)



BEŞA PÊNCAN

METNÊ DÎWANÊ YÊ BI TENKÎD

5.1. Danasîna Nusxeya Dîwanê

Nusxeya Dîwana Şêx Muhemmed Nûrî ya li ber destê me, ne ya muelîf bi xwe ye, hatiye întînsaxkirin. Her wiha ji xeynê vê me nekarî nusxeyeke din peyda bikin. Lê qeyda feraxê ya vê nusxeyê di dawîya Dîwanê de bi awayekî berfireh cih digire. Di vê qeydê de tê diyarkirin ku ev nusxe ji aliyê Muhemmedê Me'sûmê Berwarî ve di meha Rebî'ê Duyem, roja sêşemê sala 1417 hicrî, li Medreseya Xesxîrê li cem Şêx Hifzullah hatiye îstînsaxkirin ku bi tarîxa mîladî teqebûlî Tebaxa sala 1996an dike.

Nusxeya li ber destê me ne ya orjînal bi xwe ye û wek fotokopiyekê wê ye. Lê wek me diyar kir-ku hebe- me nekarî nusxeya orjînal peyda bikin. Me ev nusxe ji Seyda Ebdusselamê Bêcirmanî wergirt. Bi vê wesîleyê em cardin sipasiya wî dikin.

5.2. Rê û Rêbaza Amadekirina Metnê Dîwanê

Latînezekirina herfên erebî û metnê li gorî alfabeya transkrîpsiyonê ya standart a navneteweyî hatiye kirin. Me li xwarê listeya herfên erebî û muqabilên wan ên transkrîpsiyonê dane.

Helbestên ku ji aliyê teşeyên xwe ve di nav Dîwanê de têkelî hev bûn me li gorî teşeyên wan ji nû ve tesnîf kirin. Di serê her helbestê de me behr û qalibê wê yê erûzê jî nîşan daye.

Her wiha di cihên lazim de jî agahiyên hewce wek jêrenot hatine dayîn.

Elîfbêya Transkrîpsiyonê

ث:	Şş
ح:	Hh
ذ:	Zz
ص:	Sş
ض:	Dd
ط:	Tt
ظ:	Zz
ع:	'
غ:	Gg

Qesîde

1. ⁹⁷

Mefa‘ilun Mefa‘ilun Mefa‘ilun Mefa‘ilun

Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1. Hilavêt roj ji Berwarî çî şewqek pur ‘ecêb lê da
Şev û roj bûne wek hev tev kirin rehnî di gavê da

Zivistan bûye havîn lew feqîr îro diken keyfê
Bihar e ez gelet bûm ni‘metê havîn ketî tê da

Ruwê ‘erdê bûye rengîn çî xweş rehmî li ser barî
Li mêrgan gulgûlîn bulbul ji şewq û lezzeta tê da

Cemî‘ê qaz û qumrî rakirin reqşê şetê carî
Bi her ‘ezmanekî şukrê diken hev ra di reqşê da

5. Nema zehmet tamam bû rehmata xaliq bizan îro
Cemî‘ê xelqê ‘alem rûxweş in îro ser û pê da

Bihar û birk û hewd in ‘erdê wê îro bûye seyran
Li etrafan bih û sêv in hinar û xox tejtî tê da

Binefş û nêrgizan hev ra çî bêhn berdane van bağan
Gula sor û tamamê qismê çiçek xweş kenîn pê da

Li ser esmanê vê ‘erdê çî zîvek sahî rawesta
Biçûk û mazinan kewkeb bi hev ra şu‘le da tê da

⁹⁷ Der heqê Şêx Munewwer de [Şêx Muhemmed Nûrî]

Muqabil çehvê mexlûq seb'ê seyyare dikin seyrê
Di çavê dûribînan xweştemam çêbû neqîş tê da

10. Çi bêjim ez muheyyer mam ji heddê mentîqê derket
Yeqînen cenneta Firdews biwe zahir di 'erdê da

Şifa bû tali'ê weqtê Mesîh 'Îsa ji jor da hat
Ji lew rabûn mirî weqtê ku wî yek car nezer lê da

Çiraê dînê îslamê kire rehîni derê tarî
Cuwan bûn extiyar îro mirî rabûn di qebrê da

Ew e her murşidê zana ew e her 'arifê rênas
Binasî ger divê ew Şêx Munewwer bû di hucrê da

Çi xweş weqtek 'ezîz derket çî şewqa tali'ê da der
Çi xweş rênas û zana ye di se'ya hubb û zîkrê da

15. Çi xweş feryad û zarî rakirin esmanê heftan wî
Wekî tagirtîyan lertzîn hemî şûfî di hucrê da⁹⁸

Vekir dergahê 'eyş û noşê purcam şerab anîn
Bilav bû şerbeta 'îşqê di bagê hubb û zewqê da

Li qelban xweş veda şewqê ji pê ta qafê ser derzî
Cesed bûn bî di nav avan zirîngînî li qelbê da

Cemî'ê xelqê behs û gotinê zîkrê diken îro
Li her malê dinêrî nûjenek 'erbane wê tê da

⁹⁸ Ev beyt û ya beriya wê di nusxeya li ber destê me de nîn ; lê di çapa Xalid Sadînî û Tehsîn Doskî de ya li ser Dîwana Şêx Muşerref de heye.(Bnr., Sadînî û Doskî, h.b., r. 233.)

Ne me‘qul e⁹⁹ nekevte taê, yê yekcar nezer lê kir
Neke bawer bibîte hâkimê xwe ew di gavê da

20. Terîqa Neqşebendî daruwê her derd û her janan
Ji bêhna nisbeta wî her kesek reqşî di cezbê da

Çi rehmkê pur mezin barî çî rehni bû dilê tarî
Çi Şêx rabû ji Berwarî çî îrşad kir ewî tê da

Ji des wî xweşhuner derket çî îman û fiqir ser ket
Terîqa Neqşebend ber ket çî agir kir di qelbê da

Çi nûrek pur bilind rabû ji ber tarîti winda bû
Heta ‘erşê Xuda rabû şu‘a‘a ta‘etê tê da

Bûye furşet neborînin eman xitman neşemrînin
Tu car wîrdan neterkînin biken agir di qelbê da

25. Îlahî tu evê dewrê bidomîni evê ‘erşê
Li Şêx zêde bikey ‘umrê bike amir di ‘erdê da

Ji bo me tu bidey destûr j’me ra qelban bikey me‘mûr
Tu Şêxê me bikey menşûr di her ewqat û anê da

Heyata wî bidomîne tu îmdada ewî bîne
Hemî qeşdê wî cih bîne li her ‘erdê di gavê da

Bidey wî zêdetir quwwet bidey zate ewî sihhet
Bidey wî zêdetir qudret di her ‘îş û ‘emalê da

⁹⁹ Ji bo erûzê, peyva “me‘qûl” bi awayê “me‘qul” hatiye nivîsîn di destxetê de.

Ji bo wî milletan çêkey tu îmdadê gelek rê key
Bu wî¹⁰⁰ Rewda Medîne key qewî key wî di ‘erdê da

30. Şelatan û selam bê hed li ser yarê xwe yê emced
Muhammed tu birêj bê ‘ed bi al û tabi‘ê wî da

2.

Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilatun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + - -

1. Bêje û bibhê birader ev çi weqt û ev çi hal e
Ev çi qîl e tu beyan ke bêje min tu ev çi hal e¹⁰¹

Ser û mal em çûn di ‘işqê qeş nebû haşil muradek
Min ne dost e min ne can e min ne mal e min ne hal e

Em diçin-tên bê tebat in¹⁰² digirîn guhdar tunîne
Wek ney û nayê dibêjîn subh û êvar nalenal e

Wek ney û nayê dibêjîn hêstirê xûnê dirêjîn
Şubhê perwanê disojîn guh ker e ‘ezman me lal e

5. Hûbb û ‘işqa periyar derd û belaê zeriyan
Em kirîn wek miriyan îsal tamam bû pêncî sal e¹⁰³

¹⁰⁰ Daçeka “bi” bi awayê “bu” hatiye nivîsîn. Di hin cihên din de jî ev form peyda dibe; lê me di cihên dî de wek jêrenot nişan nedane.

¹⁰¹ Di çapa Xalid Sadîni û Tehsîn Doskî de ev beyt wek “Ev çi qîl e tu beyan ke bêje min tu ev çi qal e” derbas dibe. (Bnr., Sadîni û Doskî, h.b., r. 235.)

¹⁰² Di çapa Xalid Sadîni û Tehsîn Doskî de şûna peyva “tebat”ê “sebat” derbas dibe (Bnr., Sadîni û Doskî, h.b., r. 235.)

¹⁰³ Di çapa Xalid Sadîni û Tehsîn Doskî de (Bnr., Xalid Sadîni û Tehsîn Doskî, h.b., r. 236.) ji bo vê helbestê wek jêrenot hatiye gotin ev şîr di dema gencitîyê de hatiye nivîsîn. Lê ji vê malikê xuya ye ku ev agahî ne rast e. Lewra şair bi xwe di vê beytê de diyar dîke wî ev helbest di pêncî saliya xwe de nivîsiye.

Me nema şebr û qirarek lew di dil da pêt û narek
Dil yeqîn sohtî bi carek lew ku ez bûm şubhê dal e

Ketme destê van newaran nabihin deng û hewaran
Lew dixûnim van seharan mişlê bilbil qîl û qal e

Xweş-hebîbek pût û lat e şuhbet e her dim civat e
Pê diborit xweş-heyat e pur meyek şaf û zelal e

Nazikek şeng û şepal e hûriyek şahibcema e
Husnekî bê hed li bal e lew ku bûbîn şeyxê kal e

10. Pîr û kal bûn herifîn zehra helahil kerifîn
Ya Reb çi teb'eṭ-merif î n daîm li ser destê me¹⁰⁴ fal e

3. ¹⁰⁵

Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun

***Remel** - + - - / - + - - / - + - - / - + - -*

1. Ey su'ûda van welatan ey şirînahya civatan
Cami'ê qencê şifatan şeyxê ser kehnî meded

Ey xweyê fedl û xiṭaban ey hekîmê her cewaban
Ey şelaḥa van xiraban şeyxê ser kehnî meded

Ey xweyê w'ez û kelaman waşilê sirr û meqaman
Şafiyê derd û siqaman şeyxê ser kehnî meded

¹⁰⁴ Di çapa Xalid Sadî nî û Tehsîn Doskî de ev cinava "me"yê nîne. Ji xwe ya rast jî ev e. Lewra di nuxsaya li ber destê me de li gorî weznê jî "me" heceyeke zêde ye. (Bnr., Xalid Sadî nî û Tehsîn Doskî, h.b., r. 236.)

¹⁰⁵ Der heqê Şêx Es'edê Sanî de [Şêx Muhemmed Nûrî]

Ey tēbîbê her birînan rehîniya çehvê evînan
Şahiya qelbê hezînan şeyxê ser kehnî meded

5. Ey xweyê misk û gulavan hafîzê van dilbilavan
Şafiyê cerg û hinavan şeyxê ser kehnî meded

Ey xweyê rehîm û ‘eṭaê şahîbê luṭf û sexaê
Dafi’ê derd û belaê şeyxê ser kehnî meded

Ey reva cumle murîdan rehîniya ceşmê se’îdan
Melhema qelbê reşîdan şeyxê ser kehnî meded

Ey muradê dil keîban meqşeda cumle hebîban
Pişteşek û ‘ewna gerîban şeyxê ser kehnî meded

Ey diya’ê van zemanan ey çiraê van meknanan
Ey xweyê emn û emanan şeyxê ser kehnî meded

10. Ey tejî nûra îlahî asimanê zîv û sahî
Sebebê îflaḥ û şahî şeyxê ser kahnî meded

Ey xweyê camê şeraban ey xweyê ‘işq û kitabnan
Ey xweyê dost û şehaban şeyxê ser kehnî meded

Nûriyê purgem nîdaê pur diket hêvî ricaê
Derdê wî hûn ken dewaê şeyxê ser kehnî meded

4. ¹⁰⁶

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun

Remel - + - - / - + - - / - + -

1. Kêr giha hestî ilahî zû birêje rehmetê
Şebr û taqet qeṭ nema ya reb hilîne zehmetê

Tam di vê zıştanê yek car burqê eş û eleman
L'me veda yek car hucûm kir ordiya her 'illetê

Çar kinaran 'eskerê şermaê çêkir wan çeper
J'me birîn wan eva şebr qût û zadê taqetê

Quwwet û taqet nema yek car me winda kir su'ûd
Çare û hêvî nema winda bû nûra hikmetê

5. Qeṭ nema êdî bizanîn derdekî dermanekî
Qeṭ nema êdî binasîn melhemê yan şerbetê

Wan li me ûcağ tefandin top û tîr pur rêhtine
Em yetîm û bê mecal maîn di çola zilletê

Min hebû babek bu wî ez daîma raḥet dibûm
Vê şubatê wî wefat kir ah ji destê firqetê

Destê mi êdî nema bigrî ji tu çare û sebeb
Roj li me yek carî reş bû ketne behra zulmetê

Min digota ya îlahî her tu tê derman bikey
Bo şifaya me bi'emplînî silahê qudretê

¹⁰⁶ Di şîna Şêx Es'dê Sanî de[Şêx Muhemmed Nûrî]

10. Hukmê te her hal muwafiq bû di vê cenga zeman
Em bi hukmê te xweş in ya Reb xudanê ‘izzetê

Tu bikey îmanê kamil her xweyîti tu l’me key
Lew ji me şetand te xweyê me ey xudanê rehmetê

Her yekî digrî diket hesret heta sê roj tamam
Dê bibit ez dê bikêşim ta qiyamet hesretê

Hesreta min ya îlahî tu dizanî çû ebed
Qeş nema qelbê mi ku şabî ya bibînî lezzetê

Hesreta bê hed hesab bit ebedî bit zehmet e
Naête hilgirtin îro barê kerba hesretê

15. Her yekî ew dê biçî keyfxweş bibî lê ez tinê
Mam di vê kerbê mudamî ya Xuda dey taqetê

Tu nekey mehrûm ji xêrê ey Xuda me dilkulan
Hem ji bo me tu bide zêde sewaba axretê

Em dikeyn hevî dixazîn rehîm û îhsanê Xuda
Tu bike rehîmê îlahî ser ‘iyalê zilletê

Ez nizanim dê çewan çêkem tu ‘îş naête mil
Ne ked a dunyâê eşla te şewaba axretê

Ez ji vê daîm ditirsam lew hezer her min dikir
Piştî wî kî mir bila bimirî biçîte rehmetê

20. Çimku ew bû kehnîya ava heyatê çikiya
Xweş- te’am û xweş- şerab bû bona ehlê suhbetê

Xweş- çira bû min gelet kir roje bû rehnî dida
Xweş bilav dikra bi du caman şeraba muhbetê

Xweş dikir derman dil û mêlak dema têşa gelek
Pur hekîm bû pur dizanî wî esasa 'illetê

Sed emanet her digo 'evdîniya xaliq biken
Pur dinasî pur dikir te'rif terîqa cennetê

Kanî ew 'ilm û huner ah kanî ew zuhd û fiqir
Kanî ew şebr û hilim ah kanî tama ta'etê

25. Kanî ew we'z û mesel ah ka şebat û ka weqar
Kanî ew îrşad û îşlah kanî şerha ayetê

Tu bipirse j'van yetîman van gerîb û bêkesan
Da beyan ken wan ji dest çû îro nûra dewletê

Şifre û dana ewî mexlûqê 'alem jê dix[w]ar
Teyr û tûr jê ra dikalîn vê 'ecêba hikmetê

Hem ji bo min bê guman yek carî tarî bû zeman
Yek demê ser ewcê 'izzet ketme xakê zilletê

Ez difikrim çar cihatan şu'lekî nabînim ez
Ez di niv ce'ma merofan ketme halê gurbetê

30. Ez muşewweş bûm demek rehnî di çavan min nema
Her wekî nîva çilê avê l'yekî ken sirr detê

Bes ke **Nûrî** lew xilaş nabî evî tehqîq bizan
Melheza halê xwe ke ey kor di behra zulmetê

Ya îlahî ez şukurdar im bi hukmê te xweş im
Tu ji Şeyxê me gelek rađî bibe be cennetê

Heqqê wî heqek mezin ber me ve ya Reb tu bide
Merteba wî pur mezin ke der meqamê heđretê

Tu j' me jî rađî bibe xeyra me jî mazin bike
Bi xatirê Eħmed Muħammed şehsuwarê ummetê

35. Tu hîfiz ke cumle ewladê ewî hemyan tamam
Hem digel talûq evînan me digel be cennetê

Hem hîdayet fedlekî bê hed bide Babê Şifa¹⁰⁷
Babê Hemdulleh¹⁰⁸ bike wan Rebbî roja milletê

Me ji dergahê hebîb navê tu caran û deman
Me hişîn ke tu ji bo xwe j' lutf û fedl û rehmetê

Hem selat û hem selaman tu birêje bê hisab
Ser hebîbê xwe Muħammed babê lutf qudretê

Hem digel alan û eşhaban û etba'an tamam
Baxuşûş Şêx Es'edê Sanî nucûmê ummetê

40. Çarê zilqe'de wefat kir bikene tarîx evî
'Aşiqê cahid bi cah çû şewqê dabû cennete

¹⁰⁷ Bi "babê Şifa" qesta wî Şêx Muşerref e. Muhemmed Şifa kurê Şêx Muşerref e.

¹⁰⁸ Bi "babê Hemdulleh" qesta wî Şêx Munewwer e. Şêx Hemdulleh kurê Şêx Munewer e.

5. ¹⁰⁹

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun

Remel - + - - / - + - - / - + -

1. Ez ketim behra gemê gerqîme ez îro û demê
Ez nikarim qeṭ teḥemul kem evê derd û belaê

Qelb û dil yek ca pijan derbû li min sêsed birîn
Faîde nakin li wan te'sîr û ṭeb'ê tu dewaê

Cism û canê da bela hingî diçî dijwar dibî
Raḥet û şihhet ji min yek car xilaş kir vê webaê

Derdê min ra qeṭ nema eşla ḥekîmek bifkirêt
Ne 'ilacê tu ṭebîban ne niviştya tu melaê

5. Naête bîra min îro qeṭ xiyala dostekî
Nakevî qelbê min îro qeṭ miṭala tu biraê

Lew di îro çavê dil bînahiya çavan yeqîn
Wî wefat kir vê şubatê zîneta ḥusn û behaê

Quwwet û taqet bu wî bû, şihheta min her bu wî
Keyf û şahî min bu wî, wî me'dena luṭf û sexaê

Vê şubatê ez dirêjim hêstiran lew bi şewaṭ
Wî sefer kir axretê ez paş ve dam ḥekmê qezaê

Em bi ḥukmê te xweş in rađîne ya Rebbî tamam
Hem ji te daîm dixazîn em tamam 'ef û riđaê

¹⁰⁹ Di şîna Şêx Es'dê Sanî de[Şêx Muhemmed Nûrî]

10. Nûriyê dil-tîr-birîn ket ew ji derdan û geman
Hem ji bo te ya îlahî ez dikim hemd û senaê

6.¹¹⁰

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + - -

1. Ey rehnîya qelb û dilan ey zâkirê zîkrê b'xef
Murşidê cumle murîdan ey şehê 'alî neseb

Ey cemala muhbetê heq wey kemala şuhbetê
Saqiyê xweş şerbetê ey merce'ê kurd û 'ereb

Ey reîsê 'aşıqa[n] wey hadiyê me fasiqan
Em ketîne ber şeşan ey saqiyê zewq û tereb

Qelb û dil tevdarin¹¹¹ ji wan her xûn dizê
Lew wefata te li me şohtiye wê cerk û kezeb

5. Ey xweyê ders û mişalan ey feşîh û ey şîrîn
Ey xweyê rutba mezin bê hed xweyê we'z û 'edeb

Ey xweyê cem'a murîdan murşidê şîrîn-xiţab
Te çîqa rehnî dikir qelb û dilê tarî 'eceb!

Te dikir derman di gavê, derdê bê derman bûya
Rehm û îhsan ya Xuda bû, lê tu bû bêşik sebeb

¹¹⁰ Di şîna Şêx Es'dê Sanî de[Şêx Muhemmed Nûrî]

¹¹¹ Di nusxeya li ber destê me de wek (tevdarin/تقدارن) hatiye nivîsîn ku bi vî awayî him bê mane' dimîne him jî li weznê nayê. Lê di çapa Xalid Sadîn û Tehsîn Doskî de wek "Qelb û dil tevda birîndar in" hatiye nivîsîn ku bi vî şeklî him bi wate dibe him jî li weznê tê û ya dirûsttir ev e. (Bnr. Xalid Sadîn û Tehsîn Doskî, h.b., r. 245.)

Ey şebata bê dilan wey pişteka her bêkesan
'Aşiqê nûra Muhammed Es'edê mehbûbê Reb

Te li me wêrane kir mulk û welat tarî dikir
Te li me ferð kir di gavê gurbeta Şam û Heleb

10. Ger biket feryad û zarî rûhê şîrîn ew bidet
Nûrîyê dil-tîr-birîn yek carê qeş nînin 'eceb

7. ¹¹²

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

Hezec + - - - / + - - - / + - -

1. Çi xweş nûr e çi xweş şaf û zelal e
Çi xweş rehî didet Şeyxê Xinûkê

Çi xweş qelban diket derman di gavê
Dilan rehî diket Şeyxê Xinûkê

Çi xweş kenz e çîqa xweş kîmiya ye
Dilan zengîn diket Şeyxê Xinûkê

Çi xweş behr e ji bo me'naê û esrar
Bi dil ageh diket Şeyxê Xinûkê

5. Têbîbê dil ji bo her derd û 'illet
Kulan derman diket Şeyxê Xinûkê

Bi halê xwe ji bo Xaceê Eħrar
Yeqîn temşîl diket Şeyxê Xinûkê

¹¹² Der heqê Şêx Es'edê Sanî de [Şêx Muhammed Nûrî]

Çi bêjim ez çi kem feryad û zarî
Dilan yeğme diket Şeyxê Xinûkê

Ji min bir quwwet û ʔaqet bizan wî
Ji xûy gâfil diket Şeyxê Xinûkê

Nedîtin wek wî min zana û ‘arif
Ji hemyan ferq diket Şeyxê Xinûkê

10. Me navêtin ji geyrî te kesek dî
Ku muşkil hel biket Şeyxê Xinûkê

E naçim qeş tucar Şam û ‘Iraqan
Dilê min hey biket Şeyxê Xinûkê

Ji dil bavêje her qeşd û muradê
Ji dil dê seh biket Şeyxê Xinûkê

Bişo dil tu ji her weswas û xetran
Ji dil nêçîr diket Şeyxê Xinûkê

Ûeta kengî bes in ev qeyd û zincîr
Dilan aza diket Şeyxê Xinûkê

8. ¹¹³

Fa’îlatun Fa’îlatun Fa’îlatun Fa’îlun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

1. Suħbeta şêxê me îro pur bi ʔam û lezzet e
Her ʔe’amê ku bi ʔam bit nabitin wek suħbet e

¹¹³ Der heqê Şêx Es’edê Sanî de [Şêx Muhemmed Nûrî]

Cerk û dil rehñî diket qelbê mirî iħya diket
Şed xwezî wî qelbî ew carek nezer lê bikete

Rehñiya vê ‘alemê babê Muşerref murşid e
Bo cemî’ê dost û eħbaban xuşûşî rehmet e

Ez nizanim qîmeta wî ya Xuda iħsan bike
Lew li nik te ya îlahî ew bi qedr û qîmet e

5. Meclisa we’z û kalamê wî çiqe dil xweş diket
Lew tejî elfazê wî her weqtê ‘ilm û hikmet e

Ev ji bo me zêde iħsanek mezin bû ey Xuda
Şanê te ya Rebbî iħsan û ‘eta û rehmet e

Tu birêje qelbê me ya Rebbî nuqtek wê sirê
Ev li me yek car nezer ket ew ku babê şefqet e

Ger ku nêçîrvanê bin ‘erdê û asmanan hebin
Ev diket nêçîr dewamê muntehayê sidret e

Bulbulê bagê wisalê nazirê dîdarê yar
Ew ji wî dernakevî zewq û şuhûd û hedret e

10. Wech û sîmaê di wî her daîma rehñî didet
Lê belê men’a mişala wî weqar û heybet e

Ew wekîlê Muştefa ye dîtina wî şafi ye
Lew ku înkara ewî billahî jehr û ‘illet e

Ew siha feđla Xuda ye çavê bê çavan e ew
Ew ji rebbê ‘izzetê bo me çi behr û qismet e

Ey dilê kor û nezana rabe ser xwe bifkire
Lew ji bo te ev di îro ali' û xwe furset e

Sist û bê xîret nebe lewra yeqîn bawer bike
Yê i weqtî bûyî mehrûm ew kesê bê xîret e

15. efletê bavêje rabe tu tucar afil nebe
Yê ko te bavêjê te agir bi ehiq eflet e

Ya ilahî em nezanîn i bixazîn i bikeyn
Lew ku alib di me da heywanî û hem weset e

Tu me nespêrî evê nefsa me ya eddar û har
Lew ku rehma te nebî karê me zulm û zulmet e

Tu li nik xwe vî xûê me zêde meztir key hema
Tu bikey mufiq li ser me geri ew pur efqet e

Hem selat û hem selaman bê xilai bê 'eded
Tu bide Rewa hebîbê xwe ku rewa cennet e

20. Hem digel al û seab êx Es'edê Sanî dewam
Tu bike raî ewan riwan û hem mefîret

9.

Mefa'ûlun Mefa'ûlin Fe'ûlun

Hezec + - - - / + - - - / + - -

1. Muemmed xeyrê xelqan e Muemmed
Muemmed yarê suban e Muemmed

Muḥemmed qaşidê rehman Muḥemmed
Muḥemmed canê canan e Muḥemmed

Muḥemmed ‘illeta darû Muḥemmed
Muḥemmed derd û derman e Muḥemmed

Muḥemmed şemsê taban e Muḥemmed
Muḥemmed nûrê nûran e Muḥemmed

5. Muḥemmed rehñîya çehvan Muḥemmed
Muḥemmed rûhê rûhan e Muḥemmed

Muḥemmed efḍelê ‘alem Muḥemmed
Muḥemmed eşlê eşlan e Muḥemmed

Muḥemmed merkeza waḥyan Muḥemmed
Muḥemmed ‘ilm û ‘irfan e Muḥemmed

Muḥemmed şahibê kewser Muḥemmed
Muḥemmed teyrê ‘erşan e Muḥemmed

Muḥemmed şafi’ê meḥşer Muḥemmed
Muḥemmed reh̄m û îḥsan e Muḥemmed

10. Muḥemmed şed şelat ser bin Muḥemmed
Muḥemmed hem li alan e Muḥemmed

Muḥemmed şed selam ser bin Muḥemmed
Muḥemmed her dem û an e Muḥemmed

Muḥemmed Nûriyê ‘aşî Muḥemmed
Muḥemmed hêviya hane Muḥemmed

10.

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

1. Sed hezar car xêr silamet ey bira Hacı Şerîf¹¹⁴
Sed hezar 'izz û emanet ey bira Hacı Şerîf

Tu çuwî kul bûn gelek hêstir ji çav hatin gelek
Care dî dağ kir felek dil ey bira Hacı Şerîf

Kanî ew keyf û fereh çûn û xilaş bûn bûne gem
Ew civata şekerî ka ey bira Hacı Şerîf

Kanî ew zewq û tereb ah kanî ew lezzet 'eceb
Care dî jan da kezeb ah bira Hacı Şerîf

5. Kanî ew zîkr û sulûk ah kanî ew Xesxîr Xinûk
Ew şekir şerîn-gulûk ka ey bira Hacı Şerîf

Kanî ew 'ilm û kemal ah kanî ew husn û cemal
Kanî ew nûra zelal ah ey bira Hacı Şerîf

Bêje wê cem'a şirîn ger ku nesîb bû û te dîn
Halê xelqê têr girîn ah ey bira Hacı Şerîf

Bêje wan nûraniyan ku hin feqîr piştî we man
Ketne ber cewra zeman ah ey bira Hacı Şerîf

¹¹⁴ Hacı Şerîf ji Xelkê Perwariyê ye û di sala 1916an de, li vir hatiye dinyayê û dîsa di sala 1972yan de ji ber nexweşiyê li heman cihî wefat kiriye. Gora wî li kêleka ya Şêx Munewwer e. Ew bi eslê xwe ji eşîra Xelîlan e. Bi xwe medrese temam nekiriye; lê peyrev û sofî û murîdekî dilsoz yê malbata Şêx Es'ed bû. Ligel Şêx Muşerref, Şêx Munewwer û Şêx Nûrî təkiliyeke wî ya xurt û samîmiyane hebû.

Ka li bîr in we feqîr ya hûn dibînin wan esîr
Bê kes û bê destegîr ah ey bira Hacı Şerîf

10. Yan xwelî l'ser bûn gelek ew ketne ber çerxa felek
J'we qetan dûr bûn gelek ah ey bira Hacı Şerîf

Hêviya me her bike tu me tu caran j' bîr neke
Belkî reb teqdîr bike ah ey bira Hacı Şerîf

Em bibînin care dî wê xweş civata şekerî
Kevn e nîv keyfa berê ah ey bira Hacı şerîf

11. ¹¹⁵

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

1. Aferîn sed aferîn bo te ey xwace Huseyîn
Sed şena û medhê şîrîn bo te ey xwace Huseyîn

Qewlê te geyet belîg in lefzê te gayet şîrîn
Te bi wan îhya kirin millet û dîn xwace Huseyîn

Nezmê te gayet 'ecîb in me'niyê bê hed xerîb
Te ji wan durran tamam kir ev kitêb xwace Huseyîn

'Îşq û hubba bê mîşala te û 'ilmê pir kemal
Her ji wan nîn in jo te yek heval xwace Huseyîn

¹¹⁵ Ev helbest di destxeta li ber destê me de nîne; lê di çapa Xalid Sadîni û Tehsîn Doskî de heye û me jî ji wir wergirîtiye. (Bnr., Xalid Sadîni û Tehsîn Doskî, h.b., r. 260-261) Wek ji helbestê jî diyar e li ser Melayê Bateyî hatiye nivîsîn. Bi şiklê xwe qasîde ye û bi cureya xwe ya nezmê jî medhiye ye.

5. Nezmê Mewluda Resûl pê xweşkirin fem û ‘uqul
Bo me kurd û cahilan dirba wuşûl xwace Huseyîn

Nezma mewluda nebî mişalê wê hebit
Te bi wan zana kirin cumle gëbî xwace Huseyîn

Nezma mewluda emîn kurmancî û gâyet şîrîn
Te bi wê nû ruh kirin kurdê zemîn xwace Huseyîn

Te bi t’elîfa ewê tehqîq melayîk şa kirin
Hem ji bo te qismê muslîm şakir in xwace Huseyîn

Bo te ken medh û şena an em bibêjin sed kalam
Şukrê te nabit çiqas bêjîn tamam xwace Huseyîn

10. Minneta te pir ‘ezîm e qenciya te pir gelek
Bo wefa kîrnê divêtin sed felek xwace Huseyîn

Rebbê ‘alem te munewwer ke bi nûra Eħmedî
Reħm û iħsanê kerem ke bê ħeddî xwace Huseyîn

Pê xilas bin xas û ‘am ħaşil bibin cumle meram
Yek ji wan Nûrî Muħemmed ez gulam xwace Huseyîn

Ĥemd û minnet hem şena û şukrî daim bo Xweda
Ku ji bo vê ummetê yê wek te da xwace Huseyîn

12. ¹¹⁶

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

1. Mewlida te ya Hebîullah şifa ye her demê
Ruḥê ruhan em bi wê derman dikin derd û xemê

Hatina te reḥmetek 'am e ji bona 'alemê
Bo birînê cism û canan daîma xûş melhemê

